

Sedik Tan qetil kîrin

Endamê Komela Mafêni Mirovî û endamê sazûmana Rêveberiya HEP ê welatparêzê Kurd Sedik Tan li Batmanê ji aliye Hizbi-kontra ve hate kuştin. Sedik Tan berê ji gelek caran hatibû girtin û sîrgûn kîrin. Sala çûyi ji dewletê di otomobîla wî de bombe da teqandin, di vê bûyerê de ew û kureki xwe ji mirinê filîfîn; Sedik hingê ji çavekî xwe bû.

Rûpel 15



Serokê Komîteya Rêvebirina Kar û Barê Hikûmeta Kurdistana Sor Wekîl Mistefayev:

'Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmettir tiştek nîne'

● "19 rewşenbîr û zaneyên Kurd di nava pêkanîna kar û barê komîteyê de hatine bijartin. Me wisa ji ala kesk, sor û zer pejirandiye wek sembola komarê, li ser navê serokatiya yekîtiya neteweyan û hemû dewletênu ku endamên hevalbendiya Ewrûpayê ne re bang hatiye rîkirin ji bo hikûmeta me nas bikin."

● 23'ê Hezîranê êvarê rojnamevanê me P. M. bi telefonê bi berpirsiyar û serokê Komîteya Rêvebirina kar û barê Hikûmeta Kurdistana Sor Wekîl Mistefayev re li ser rewşa Laçînê ya îtroyîn axivî. Em li jêr vê dengkirinê bi kurtayî pêşkêşê xwendevanê xwe dikin. Di rûpelê 15 an de bixwînin.



KONFERANSA ENSTÎTUYA KURDÎ

Roja 20.6.1992 an li Enstîtuya Kurdî Prof. Celîlê Celîl, li ser xebatênu enstîtuyê û metodênu karkirinê konferansek da. Avakarênu Enstîtuyê û çend rewşenbîren Kurd besdarê vê konferansê bûn.

Rûpel 15

BBC protesto dibe

● Ji Newroza îsal û vir de, ferqa BBC û rojnamegeriya Tirk ji hevûdin nemaye. Ew ji wek hemû rojnameyên Tirk sê meymûnan dileyîze, çavê xwe ji kirin û hovîtiyên ku artêsa Tirk li Kurdistanê dike re digire. Dema behsa bûyeren gerîlayen PKK'ê dike, ji daxwiyanîyên waliye herêmê pêştir, tu tiş pêşkêşê guhdarênu xwe nake.

Ji ajansê herî mezin û girîng Di warê objektifiteyê û di ên navneteweyî, yek jê BBC rastdayna nûçeyan de, kesî tu ye. Ev ajans li hemû dinyayê, şik ji vê saziyê ne dikir. bi cidiyet û nealîgiriya xwe, Ev helwesta BBC ya xwe dabû qebûlkirin. Ta berî demeke kurn ji bi bêtrefîya dibû sedemên guftûgo û xwe, xwedî cihekî bi rûmet gengeşiyên mezin. Meclîsa bû. Dema digotin BBC, nealf- gîrî û rastî dihate bîra mirov. rîveberiya

Dewlet û rojnamevan

Dewlet bela xwe ji rojnamevana venake; an wan dide kuştin an davêje zîndanan.

Nûçegihanê rojnameya Özgür Gündem, yê Uludere Mustafa Kara 25'ê Hezîranê ji teref komandoyan ve hate girtin.

24'ê mehê ji du rojnamevanen Özgür Gündemê yên Amedê, Mehmet Şenol û Rauf Yıldız hatibûn girtin. Di hundir de bi mirinê têne tehdîtkirin, lêdan dixwin û dûre têne berdan. Li aliye din nûçegihanê Özgür Gündemê, yê Nisêbînê Vahap Aslan ji demeke dirêj ve ye girtî ye.

Mebûsê ku ji SHP ê vejetiyan di 26.6.1992 an de Partiya Azadî û Wekhevî avakirin. Ji demeke dirêj ve mebûsên ku ji SHP ê vejetiyan li holê

mabûn, lewra ji bo ku partiyek bibe xwedî grûb pêwist e ne kêmî 20 mebûsî bin. Hejmara wan ne gihîstibû 20 mebûsan

Rûpel 15

Weqfa Çanda Kurdî hat avakirin

Roja 21.6.1992 an de ji bo Sağrıç, Yaşar Kaya, Süleyman İmamoğlu, Musa Anter, İbrahim Gürbüz, Senar Turgut, Abdurahman Durre, Pertev Işık, Celîlê Celîl, Necdet Boldan, Esber Yağmurdereli, Talat İnanç û İbrahim Çerimli navê herî balkêş bûn.

ROJEVA WELÊT

Hizbûldewlet, hizbûlsezzîn û hizbûlerkan

Erd li hikûmeta Demirel û dewleta militarîst teng dibe. Ciya û deşten welatê me li wan têne hev. Hindik maye axa Kurdistanê wan dabeliine û daqurtîne.

Şerî Kurdistanê fireh dibe, ber bi bakurê welat, rojava û sinorêna hawîrdor ve dipijiqe.

Rûpel 15

REWS

Abdullah Keskin



Kevin-nuh

Capemeniya Kurdî iro dikeve merhale-yeke nuh. Li dinyayê ragihandin gellek bi pêş ketiye. Em ne di dema Miqdat Mîhdad Bedirxan de dijîn û ne jî di dema Mîr Celadet Bedirxan de. Edî ji her alî ve imkan pirr in.

Xeletî û kemasî her dem çedibin. Tiştê girîng ew e ku mirov van xeletî û kemasîyan weke metodekî nep1 zMîne. Divê bingeh xwirt were avakirin.

Amed Tigrîs hefteya berê di nivisa xwe de, li ser weşanên bi kurdi û tirkî sekinî. Bi baweriya me jî ew dema ku di kovareke 60-70 rûpelî de, 2 rûpelîn bi kurdi derdikevin, li paş ma. Li Tirkiyê jî hê tu kes ne mecbûr e ku tiştîn bi kurdi dinivisine, bi tirkî jî binivisine.

Nivîskar Deham Evdil Fettah (S.Y) ji Sûriyê, pirtûka xwe ya nuh, "Nêrîneke Rexneyî li Helbestenê Kurdi" şandibû. Pirtûk 180 rûpel e. 12 rûpelîn dawî bi elfabeja erebî hatiye nivîsandin, ziman jî

erebî ye. Min sebeba vê fêm nekir, ji ber ku eynî nivîs bi elfabeja latînî û bi zimanê kurdi hebû.

Di van rojan de, nivîskarê "Kela Dimdimê" Jan Dost (ew jî li bin xetê, Kurdistana Sûriye dijî) hate ziyareta me. Em li ser rewşa welêt axivîn. Me vî tiştî jê pirsî. Li gor qanûnê Sûriye ji bo pirtûkek bi kurdi were weşandin, divê erebiya wê jî

Iro li ser rewşa Kurdan, her çiqas yên bi kurdi kêm jî bin, gellek pirtûk derdikevin. Berî bi 3-4 salan pirtûk û rojnameyeke ku navê Kurdan tê de derbas dibû me distend û dixwend. Weşanên niha derdikevin pirr zêde ne. Divê em li tiştî "ji bo me" li ser "navê me," lê dûrî rastiya me xwedî dernekevin.

were nivîsandin. Wexta ku bi erebî neye nivîsandin, destûra çapê nadîn.

Li Tirkiyê hê qanûnêke wilo peyde nekirene. Dixwazin rî li ber me bigirin, lê nikarin. Ji xwe sawcî û hakimên DGM ji kurdi fêm nakin. Iro gellek nivîsîn ku bi kurdi têne weşandin, heger bi tirkî bûna wê di du rojan de hemû hatibûna komkirin.

Weke xelkê me rewşenbirêne me jî

dilnizm (nefsbiçûk) in. Çi dibînin bi wî idare dikin. Ji bo mînak, pirtûka Mehmed Emîn Zekî, Tarixa Kurd û Kurdistan, cilda yekemîn di sala 1977 an de, di nav weşanên Komal de derketibû. Gellek kemasîyen wê çapê hebûn. Kemasîya mezin bi baweriya min, di aliye wergerê de bû. M.A. Avnî ev pirtûk ji kurdi wergerandîye erebî. Pirtûka di destê me de jî, ji erebî wergerandîne tirkî. Ji bo sala 77 an belki ev normal be. Lî piştî 15-16 salan, wextê ev pirtûk ji aliye weşanxaneke din (Beybûn) ji nuh ve weke xwe were çapkirin, mirov bixwaze nexwaze şibhe dike. Gelo literatura kurdi di cihê xwe de sekînî?

Gellek weşanên ku berê li Ewrûpa derdiketin û niha edî li Tirkîye derdikevin bidin ber hev, hûnê heq bidin vê pîrsê.

Iro li ser rewşa Kurdan, her çiqas yên bi kurdi kêm jî bin, gellek pirtûk derdikevin. Berî bi 3-4 salan pirtûk û rojnameyeke ku navê Kurdan tê de derbas dibû me distend û dixwend. Weşanên niha derdikevin pirr zêde ne. Mirovên nizanîn navê Ehmedê Xanî rast binivisîn "Antolojiya Helbestvanenê Kurdi" derdixin. Divê em li tiştî "ji bo me" li ser "navê me," lê dûrî rastiya me xwedî dernekevin.

FERHENGOK

Avteng: Boğaz	Çanakale:
Avtenga	Bogaza Çanakale
Bajarvan:	Şaristan
(medenî)	
Bajarvanî:	Şaristanî
(medeniyet)	
Bandûr:	Hakimiyet, egemenlik
Berjewendî:	Menfeet
Dad:	Adalet
Doz:	Dawa
Dozdar:	(davalı)
Dozvan:	(davacı)
Giram:	Hurmet (saygı)
Girav:	(ada)
Guherandin:	Değişiklik
Helwest:	Tawir (tutum)
Hemdem:	(çağdaş)
Hîkarî:	Tesîr
Komela mafîn mirovan:	Derneka heqen mirovan
Maf:	heq
Mafîn mirovan:	Heqen mirovan
Nandoz:	Yaltakçı, otlaklı
Raya gişî:	Kamuoyu
Rêzdar:	Birêz (sayın, saygın)
Rêzdarî:	Girambarî (saygınlık)
Raperîn:	İntifada, serhil-
Tevger:	Hareket

Merheba

Gellek silav û merhebayê germ û gurr; Li welatê gelê bindest, Li şervan û xebatkaren wî, Li xortê hêja û keçen dilovan Li dayikên dîlbikul û hêvidar Li deryaya wañ û çiyyâye xelatê sîpan, Li Cûdi, Herekol û Gabar ku têkoşînê bilind dîkin, Li van çar hevalên ku xwe ji bo Kurdistanê şewitandin Ferhat Kurtay, Eşref Anyîk, Mahmut Zengin, Necmî Öner Li Kawayê hemdem, şoreşger Mazlum Doğan ku bû ronahû ji me zarokên Kurdan re

Li alava Newrozê Zekiye Alkan, Li keça Qasim Leyla ê serhêza keçan, Bêrîvan Li Mûsa Anter, li sembola biratiyê İsmail Beşikçi Li tim xebatkar û nivîskarêne rojnameya navxwes û navezîz Welat re, bi xêr û xweşî derkeve.

Li gelê me pîroz be.

*Êncî Egît
Dîlbikul û hêvidar im ji Melezgîra Mûsê me.*

KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ... pê ve min bikin aboneyê Rojnameya WELAT

Nav

Paşnav

Navnîşan

Bedelê abonetiyê razînîn:

Li Tirkiyê : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Hesap No: 379809

Li Derve : Y. Serhat Bucak İş Bankası Cağaloğlu
Şub. Döviz tevdiat hesap No: 3113617

Aboneyen hêja,

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînîn. Navnîşana

WELAT Nuruosmaniye Cad. Atay Apt.

No:5 Kat:1 D.4

Cağaloğlu / İSTANBUL

Tel: 511 57 60-511 66 02 Fax: 511 51 57

Mercen abonetiyê:

Li hundir

6 meh

60.000

12 meh

120.000

Li derive

30 DM

60 DM

Li berhemên xwe xwedî derkevin

Rojen fireh û azad ji gelê me re bin û yên ji bo gel dixebeitin rojen ronî ji wan re bin. Iro çand, huner û jiyana gelê Kurd sînorê qedexe qelaşti ye û ber bi serfiraziye û xelasbûnê ve bi qerar li du partiye û serokê xwe dimeše.

Di vê meşê de ji dayikên Kurdan, kalên wan û zarokên wan bigire heta gelê Tirk ên ku rast in jî alîkariyê dîkin.

Em xort bi rasî pêwist e cihê xwe li pêşî bigirin û bimeşin. Keç û xortê me yên jêhatî peywira xwe ya şoreşê bi can û jiyana

xwe tînin cih. Em jî divê di cihê xwe de hin tişt bikin. Weke ci? Divê haya me ji belavbûn û firotanên kovar û rojnameye û kurdi hebe yan jî ji lêxistin û firotanên kaseten bi kurdi hebe.

Em bi bayiyen ku rojnameya Welat naflîşin re şer dîkin. Em dixin bîra wan ku mecbûr in bifroşin. Yen ku vê mecbûriyetiye xwe neyin cih eme ji we re navnîşanên wan bişînîn.

Rojbaş
Silêman Xortê Farqînî / Burdur

Silav li we

re dayîk dizanîm

Bi her şehîdeki re ez jî dimrim û dihelim.

Cihê ku ez niha lê me pirr şûnda maye û pirr hatiye tırsan û xapandin.

EZ bi şev û roj ranazêm û tim dixebeitim. Lî hevalên min ên ku ez bi wan bawer bim tune ne.

Bi kurtayî ez dixwazim rojnameya delal Welat û nivîskarêne wê pîroz bikim. Ü dibêjim azadî, serxwebûn û pêşveçûn. Kesk û sor û zer.

Reşoyê Têrkî / Bajarê Amedê

Gelî hevalên birêz

Apê Mandela

Biryar a te bixêr
Dê bibiriqe di dîrokê de wek zêr.Me dît, hûn li dinê hene mîr,
Ü dicirînîn tariyan wek stêr.

Me dît, çawa serê rûreşan dikin ber.

Yen ku nakin bi serîk sîr,
Ü xwestin avê têxîn nav sîr,
Dîtin ku di tûr hilnayê tîr.

Lewra ez karim bêjîm, rojêne xweşik ji me nedûr.

Reş û spî wek mast û mit,
Em dê azad bijît.

Hevalê rabe

Hevalê rabe, ev wiha nabe,
Gel hişyar bike, da ku dil şa be.

Wextê me teng e, rabe, dereng e,
Hawar û gazî, qêrrîn û deng e.

İro kulmal î, ji kûr dinalî,
Hatiye girtin li te çar alî.

Rabe bibîne, ka ewa kî ne,
Giş biyanî ne, kes ji me nîne.

Ewa neyar in, pirr hov û har in,
Xwîna me mijtin, keda me xwarin.

Girtin û kuştin, em par re hiştin,
Ser axa welêt, hatin, rûniştin.

Welat qelandin, mirov helandin,
Heyî û neyî timî şêlandin.

Bo me serbestî, bûye zordestî,
Em bûne kole, mane bindestî.

Ba xwe zilam in, welê xulam in,
Kar û barêne me çima ûlam in?

Bêserşûn mane, dest jev berdan e,
Navnîşan û rewş bo ci derdan e?

Gelê me baş e, lê belê şas e,
Di nav cihanê gelekî paş e.

Ber çavan perde, tev kul û derd e,
Zehf barêne giran hatine ser de.

Bêhevalbendi, anî dubendi,
Teposer bûne bajarrî, gündî.

Bes e bedewê, rabe ji xewê,
Da bixebeitin bi roj û şevê.

Wekhev mîr û jîn, hev re bibêjin,
Tîr û tariyê, rakan bavêjin.


Şiyar bin em tev, bê tîr û bê rev,
Keç û xortemîr destan bidne hev.

De rabe xwahê, tu were dayê,
Roja ges û xweş bêyî te nayê.

Ma ku gêr me nayê, qey ji me nayê,
Ku azad bijîn heta hetayê?
Şems'ê Kurdi

Bi mebûsê Wanê yê serbixwe Remzî Kartal re hevpeyvîn

'Mesut Öztürk namzetê HEP'ê û gelê Wanê ye'



Remzî Kartal: "Di siyasetta me de eşîrî nemaye, ta em eşîrîyê bi temamî neşkinin tu maneya têkoşina me nîne. Gel ne ji bo eşîrîyê daye pey me, serfiraziya me, ne bi saya têkiliyên eşîrî çêbûye. Têkoşina neteweya Kurd têkiliyên eşîrîyê ji holê rakiriye."

Kekê Remzi hilbijartina belediya bajarê Wanê çawa derbas bû, hûn ji kerema xwe re bi kurtasî karin bînin ziman?

-Belê keko; namzet (berendam) ê belediyê bi navê xwe Mesut Öztürk e, Mesut ji SHP'ê hate kifş kirin, gel ew xwest ji ber ku mirovekî welatparêz e, Mesut namzetê gel e ne yê SHP'ê ye, tu girêdana SHP û xebata SHP'ê ji bo hilbijartînê çênebûye, HEP û gelê Wanê ev mirov kiriye namzet ji xwe re.

Mirov kare bêje êdî gelê Kurd bi rôexistin e, qedera xwe bi destê xwe dixwaze tayin bike, lewra mirovê welatparêz ji xwe re dike berendam, sedemê vê rôexistin û pêşketinê ci ye?

-Belê, belê kekê min, li bajarê Wanê ev 30 sal in ku kesê paşverû namzetê belediyê û mebûs bûn, belê iro çerx hatiye guherandin, bi têkoşina neteweyî ya gelê Kurdistan, gel hevgirtî, bi tifaq û bi rôexistin bûye, lewra iro gelê Kurd bûye xwedî rôber, rôzan û serok, bûye bi bîr û bawerî paşverûti û têkiliyên eşîrî heke ne bi temamî be jî, bi pirranî li Kurdistanê hatiye şikandin, ev hilbijartina ku gelê Wanê ji nav xwe namzet neqand tiştekî zehf rend û ronahî ye, di hilbijartînê de gel weke here dîlanê dihate

ser sindoqan û raya xwe davet. Gel neda pey partiyen burjuwazî, da pey bîr û baweriya xwe...

Iro tu baweriya gel bi SHP'ê nema ye, lewra gellek qetşam li Kurdistanê hatin kirin, SHP çavê xwe ji vê re girt, hûn mebûs ji ber vê yekê ji SHP'ê qetian, lewra riyan demokratik ji ber we hatin girtin, belê mebûsên ku dev ji SHP ê bernedane ji hene, çavê xwe ji xwinrijandina gelê Kurd re iro girtine, vî gunehî bi hikûmeta koalisyonê re par dikan. Ev mebûsên ku bi rayen gelê Kurd ketine meclisê wê sibê çawa derkevin hafa gel?

-Belê belê kekê min ev pirsê te tev rast in û di cihê xwe de ne, ji ber ku riyan demokratik ji me re hatin girtin û hikûmeta koalisyonê destê xwe di xwîna gelê Kurd de da em jê vejetian, em nebûn şirîkê vî gunehî, lewra ev súcekî mezin bû, ku em di hikûmeta koalisyonê de bimana, emê bi ci dirûvî biçûna nava gelê Kurd. Heke iro em hatibine meclisê em ne bixwe hatine neqandin, em bi qerara gelê Kurd bûne namzet, heke em ji kul û birînê gel re nebîne hekîm ji xwe tu mana mebûsûna me nîne, hinek dixwazin navbera gelê Kurd û Tirk vekin, kûr bikin, tovê

neyartiyê biçînîn.
Giring e ku em li gora demê xwe amade bikin, li ser pirsgirêka muhîm û ferz bisekinin, bi şev û roj kar û xebat pêwist e, lewra iro li Kurdistanê roja bê xwîn tune ye.

Li gor dîtina we wezîfa mebûsên Kurd ci ye, divê ci bikin?

-Esas tesîr îrada gel e, êdî gelê Kurd dixwaze qedera xwe bi destê xwe tayin bike, êdî gele Kurd naxwaze neyarê wî, hikûm lê bike û wî idare bike.

Me jî ev ji gel re got, giring e ku qedera we di destê we de be, konevanî û ramyariya xwe hûn bimeşînin, çavê we ne li ber destê kesî be, heke em ji kul û birînê gel re nebîne hekîm ji xwe tu mana mebûsûna me nîne, iro pirsgirêka Kurdan bi sloganan hal nabe, wezîfîn giran li ser milê me ne, lewra her roj li Kurdistanê xwîn diherike, ku em bêdeng bimîn ev gunehîkî mezin e, ev súc e, giring e ku em lingê xwe li gora demê bavêjin... Hikûmeta koalisyonê xwîna gelê Kurd dirjîne em ji bo vê yekê ji SHP vejetian, em nebûne şirîkê vî gunehî, ji ber ku ev súcekî mezin bû, belê hê hevalen me yêne neveqetiyayî hene, di bin bareki bi guneh de ne, şirîkê rijandina xwîna gelê Kurd in, ka wê ta kengî di bin vî gunehî de bimeşin, hêjî ne xwiya ye, lê di nêzîkayî de wê kifş bibe.

Di vê hilbijartînê de li Wanê ji bo serfiraziya Mesut tu tesîra esîra we çêbû?

-Di siyasetta me de eşîrî nemaye, ta em eşîrîyê bi temamî neşkinin tu maneya têkoşina me nîne. Gel ne ji bo eşîrîyê daye pey me. Em eşîra Brokî ne, lê serfiraziya me ne bi saya têkiliyên eşîrî çêbûye. Têkoşina neteweya Kurd têkiliyên eşîrîyê ji holê rakiriye.

Saristan Arjen

Daxwiyanîya girtiyê PKK'ê

Roja 8'ê Hezîranê rojnamevan Hafiz Akdemir bi awayekî hovane hate qetil kirin. Bes ev ne tenê qetilkirina rojnamevanekî bû, ev di şexsê wî de qetlameke li dijî mirovahî û gelan e.

Li Kurdistanê her roj kuştin, işkence, sîrgân, gundvalakirin, malwârankirin û her cure kirinê li derveyê mirovahî ji aliyê dewletê ve têr kirin. Ev demek e, dewlet bi kûçikîn dev bi kef 'Hizbî-kontra' mirovân me yêne welatparêz û pêşverû dide kuştin. Dewlet bi taybetî bi navê Hizbî-kontra êris dibe

ser rojnamevan ên welatparêz, ji ber ku ew rastiyê dinivîsin, qetşam û pîşîtiyê dewletê derdixin meydanê.

Ji bo ku çavên rojnamevan bitirse û neçin Kurdistanê dewletê Halit, Cengiz, Izet û Hafiz qetil kirin.

Bi kuştina van rojnamevan dewlet hewl dide xwe ku pêşveçûnê li Kurdistanê bisekinîne û agirê têkoşina azadiya gelê Kurd vemirîne.

Ev şerek e; ev şer xwe di hemû warêñ jiyanê de dide xwiya kirin. Hafiz Akdemir ji şervanekî çapemeniya serbix-we bû.

Ev şer ta gelê me bigihîje azadiyê wê dom bike û gel wê bi hezaran Hafizan bigihîjîne.

Em hemû kesen ku xwe demokrat û şoreşger dihesib-nin, vedixwînin da ku dengê xwe li hember van qetşaman bilind bikin.

Em çapemeniya burjuwa ji ji ber ku wek şaxekî MİT ê dixebite û rastiyan berevajî dike protesto dikan.

Hafiz namirin
Bijî şerî azadiya gelan
Girtiyê PKK'ê
yêne girtigeha
Saxmalcilar

KONEVANIYA NUH

R. Cizre

Parlamenteriya klasîkî nabe

J i bo parlamenten SHP, Fehmî bey, Salih efendî, Adnan axa û Sehepecî Abdulkerîm.

Eger mirov fedî neke dikare her tişî bike.

Di hilbijartînê meha Cotmeha 1994 an de, gelê me bi sed hezaran daket meydanan û vê carê xwest dengê xwe ji bo xwe bide, nebe dûvê keseke û nekeve xizmeta hêzîn reş.

Helbet gelê me di van hilbijartînan de, ji bo peydakirina çend bürokratan nexebitiye. Di encamê de ji komeke welat-parêz û demokratîn Kurd, bi nasnameya (kimlik) xwe ya Kurdi ve hatin qebûkirin û di (medîsa TC) de cihê xwe girtin. Lê, çend mirovî nemerd ji, di rojîn kampaniya hilbijartînê de lewlebaziyên xwe kirin, gotin "gelê me, emê di meclisê de xulamtiya we bikin, emê dengê we bilind bikin û li pirs û problemen we xwedî derkevin".

Nîha, çar mirovîn ku em vê nameyê ji bo wan dişînîn. Pişta xwe didin gel, irade û vîna gel qebûl nakin. Derdê wan bûye meqamekî bilintir, pereyên bêhtir, cihê xwestir, û teahudiyê mezintir.

Ho... mirovîn ku dixwazin bi qedera gel bileyzin!

Wiha nabe.

Li pêşîya we, heta dawiyê rî girtiye.

Berî çend rojan mirovîk ji welat hatibû, listeya navê şêhîdîn Newrozê da destê min. Hûn ji baş dizanin ew 103 mirov bûn. Dûre min ji xwe re ev hesabê ha kir:

Bi kêmânî kuştina 51 şêhîdan dikeve ser milê partiya we ya "delal" û li gora wê pîvanê hema bêje her parlamentereki SHP kuştina mirovîk dibe para wî, heta vê rojê hûn hîna ji SHP cuda nebûne, lewma gelê Kurd wê we weke qatîlîn şêhîdîn xwe nas bike.

Tu kesekî dengê xwe nedaye we, ji bo hûn qerewatê xwe bişidînîn, cihê xweş bikin û bîryar û kararnameyê kuştina Kurdan îmze bikin.

Xwiya dike, hûn hîna ehmeqên dîrokê ne. Jî Hasan Hayrî bêhtir hûn nikarin xulamtiyê ji dewletê re bikin, lê ci bi serê wî hat herkes dizane! Di Lozanê de ji hevalen we şêx û begê parlamente, ji bo nav û meqamên xwe kuçiktiya İsmet "efendî" kirin. Niha jî hûn dixwazin jehra kurê İsmet û gemara SHP bi gelê me bidin qebûl kirin.

Ne vê yekê, hûn nikarin zikên xwe yên mezin jî têr nanê hişk bikin.

Hûn li dûv ci ketine em dixwazin bizanbin.

Cudahîyên di navbera ANAP, DYP, TKP -sexta, MHP û yêne din tev de ji, li hemberê gelê me ci ne?

Qet tiştek tune ye.

Her roj bombardimankirina bakur û başûrên welat çiqasî prensibîn demokratîyê ne?

Di Newrozê de koalisyon çiqasî demokrat bû?

Kuştina rojnamevan ên mîna Cengîz Altun û Hafiz Akdemir çiqasî prossesa demokratîyê xurt dikan?

Eger qoalîsyon demokrat be pêwist e em wêneyên Hîtler û Franko li enîya xwe bixin.

Sembola vê qoalîsyona ku, hûn xizmeta wê dikan, tabance û maskeya kontr-gerilla ne.

Serok û bîrêvebirê kanal û mekanîzmeyen bi dizî dixebeitin Erdalê we bi xwe ye.

Mesele ewqasî ne bi hewceye siyasetê ye.

Hinek xîret û namûs lazim e.

Hûn bi dûv ci ketin em nîzânîn. Binêrin dema parlamente-riya klasîkî û bi wê yekê komkirina peran derbasbûye. Kesek nikare bi qedera me bilize. Di siyasetê de gelê me fêri dersa matemâtikê bûye. Kî ci ye? Kî li kuderê ye? Kî ci dike? Hesabê kê çiqas e? Gel bas dizane.

Ji bo kumê bavê we û tiqtîqa kenê jînê we kesekî dengê xwe ne daye we.

De haydê, virde wirde ne hewce ye. Eger pozê we dişewîte ecele daxwazname (dilekçe) yên xwe binivîsin, istîfa bikin.

Cenga psîkolojî: Metoda nuh, leyîstika kevin

Yekda Welat

Kontrolkirina cîhana sisêyan ji bo Yekîtiya Welatê Amerîka (USA, United State of America) bi her babêti pêwist e. Pêwistîya wê ji bo berhemên aborî, mal û madê cengê ye, dixwaze cîhanê ke nuh di bin kontrola xwe de biafrîne. YKD dixwaze bi zor û koteke gelê cîhanê bike bin kontrola xwe. Ji bo karibe cîhana sisêyan bike bin kontrola xwe, bi gellek awayen dijwar, veşartî û gemar, şerê psîkolojî kar kiriye û kar dike.

Cenga sar di navbera Amerîka û Sovyetê de hate dawiyê. Şerê taybeti, şerê psîkolojî iro li welatê me û dewletên dinê dîsa bûye xala rojane. Ji bo têgîştina şerê taybeti em dixwazin ji dirokê metodekê bi xwendevanê xwe bidin naskirin. Bê guman gellek metodên dinê ji hene û ew ji herî pêwist in. Lê iro li Washington dîsa ew metod bi navê xwe Counterinsurgency (Tunekirina Serhildanan) xwe nuh kiriye, CIA û Parastinê dinê wek Mossad, MIT, KGB û hwd. bi vê metodê kar dikin. Her wiha di welatê me de ji bi vê metodê pirr kar û barêni li dijî mirovahiyê amade kirine û fro dixwazin gelê Kurd bi vê metodê ji rüpelên cîhanê biqetînin û bişewîfînin. Ji ber ku navê Counterinsurgency pirr dijwar û xedâr e, diewleta Amerîka navê wê guhertiye. Navekî nerm, ne împîrîal û xwînîr lê kiriye. Navê ku iro CIA, Parastin û dewletên kedxwar pê kar dikin ev e: Low-intensity warfar (şer bi dereca nizim). Li Viyettam diewleta Frensi û Amerîka bi her babêti Counterinsurgency bi kar anîn û dîsa ji gelê Viyettam bi baweriyeke yekîti ji bo serxwebûn û azadiya xwe leyistikê emperyalizmê eşkere kir û tune kir. Lê dîsa ji emperyalizm û mêtîngîrên welatê me wan metodan, bi navekî dinê, wek li Viyettam, bi kar anîne. Lewma ji em dixwazin wan bûyerên ku

Amerîka û hevalbendê wan li Viyettam bi kar anîne ji we re pêşkêş bikin, daku her mirov şerê psîkolojî ya li welatê me hinek binase.

Daxwazên Counterinsurgency bi kurtayı ev in:

Sala 1962 an serokê diewleta Amerîka President Kennedy bi navê National Security Action Memorandum No. 124 komîte çêkir û serokatiya Counterinsurgency pêkanî. Serokê wê komîte General Maxwell Taylor bû. Walter Rostow rolekî mezîn di afirandina metoda Counterinsurgency de leyistiye, dixwest bingehêne Gerila winda bibin, divîn "masî" ji "barê (derya)" dûr bibin...

Hilsaman yê ku ekspertê Counterinsurgency bû wiha dixwest: "Divê guhertiên siyasi çêbibin û Partiyê mezîn (yê reformist) werin afirandin, daku gel ji daxwazên xwe dûr bibe."

Hinek xalêni pêwist yên metoda Tunekirina Serhildanan:

1. Zilm û koteke li dijî gel bi dereckeke nizim.
2. Metod dixwaze gel kontrol bike û mêmîyê xwefirotinê bide gel.

3. Şerê Komên Taybeti wek Grénada, Panama û Komên Mirinê wek li Latin Amerika.

4. Tunekirina Serhildan bi Kontr-gerîla wek Nikaragua û El Salvador...

5. Cudakirina Gerila û gel

6. Derxistina hinek Eşiran û Aşan li dijî Gel û Têkoşîna Rizgariya Neteweyî

SERÊ PSÎKOLOJÎ LI VIYETNAM

Wek tê zanîn berxwedana gelê Viyettam pêşî li dijî mêtîngîreñ Japan destpêkir û li dû Cenga cîhanê ya dûyemîn de mêtîngîreñ Fransî û dûre Amerîka ketin Viyettam û bi hovîtiye mezin barbariya xwe domandin.

Di destpêkê de Amerîka bi her babêti alîkariya hikûmeta Viyettam

nama Başûr bi serokê Diem re kir û bi pêşvebirina başûr, li dijî bakur civaka gelê Viyettam kete belengaziyê û birçibûnê. Diem û hevalbendê xwe gel talan kîrin, koçberkîrin, hingavtin û kustîn bûbû bernama rojê.

"Niha li Kurdistanê ji bi vî awayî mêtîngîr mafîn mirovan nas nakin û qirkirinan çedîkin. Bi rastî ev 70 sal in, li Kurdistanê, dijmin bi hovîti Kurdish qir dike."

Bi gurbûn û mezinbûna şerê emperyalizmê li dijî gelê Viyettam, Amerîka bi bernama (program) avakirina gundê strateji wek li Malaya destpêkirin. Armanç dîsa ev bû ku gelê Viyettam û Gerila ji hev dûr bibin.

"Li Kurdistanê gund tên wêrankirin, daristan tên şewitandin û çiya tên bombekirin... Gundîyan koçber dikin, ciwanêne Kurd dişîn Ewrûpa..."


Di bernama Counterinsurgency de li Viyettam rîexistinê avakirin ya ku li dijî gerila şer kir, zilm û koteke anî şerê gelê Viyettam û nokerî ji emperyalizmê û hevalbendê wan re dikir.

"Gundparêz (Köy Korucusu) û Komên Reformist iro li Kurdistanê bi destê dijmin wî karî vekirî an ji veşartî didomînin."

Bi wan "Gundparêzan" û hêzîn taybeti bi hezaran gundiyyê Viyettamî ji gundêñ wan derxistin û birin gundê strateji, ango yên dibin kontrola Amerîka û nokeran de bû. Ji bo ku gelê Viyettam ji gundêñ xwe derkevin, gundêñ wan, qûtêñ wan, mîrgêñ wan, hebûn û erden wan hate şewitandin, daku nikeribin li wê derê bijîn.

Bernama Counterinsurgency di sala 1963 an de zû ket. Sedemê binketina wê bernamê û metodê ji ev bû ku gel û gerila ji hev dûr ne bûn. Gel û gerila bi hev re helîyan û bûne têkoşîna rizgariyê.

Her çiqas gel ji gundêñ wan derdixistin û dibirin gundêñ



'Ez gel nekujin'

strateji, her wiha militanên FLN ji diketin nava gel û bi gel re dijîyan û ramyariya xwe ji bo azadiyê û rizgarkirina niştimanâ xwe dimeşandin.

Xaleke pêwist ya tunekirina Serhildan (Counterinsurgency) ev bû ku emperyalizm serokê

esîran û axa yên li serên çiyan ku gel kontrol dikirin ji xwe re bikin kole, wan bi çek bikin û rîexistinê li dijî gerila derxin. Ev esîr û malbatê kevneperek, bi pirr hêsanî li aliye CIA kom bûn û bi navê "Mîlisîn Parastinê" li dijî Eniya Rizgariya Neteweya Viyettam (FLN) şer kirin. CIA ev esîr û axa birin erdimen pêwist daku şerê gerila were rawestandin.

"Li

Kurdistana Başûr diewleta Amerîka û mêtîngîreñ bi serokê esîran yên wek Berzanî û Telabanî re ev metod baş bi kar anîne. Berzanî bi xwe amade ye ji bo Tîrkiye tixubê (sinor) navbera erdimâ Behdînan û Botan "kontrol" bike. Iro "Mîlisîn Parastinê" yên Tîrkiye li Kurdistana Başûr li dora Mesut hatim komkirin.)

Sala 1963 an de serokatiya

Bi sedhezarân di bernama Counterinsurgency de dixwestin projen aborî pêşve bibin, daku serokê esîran û axa, gel di bin kontrola xwe de birawestin û gel xwe ji mafî xwe yê bingehîn, ji azadiyê û serxwebûn û dûr bikin.

"Iro li Kurdistanê diewleten emperyalist bi her babêti alîkariya serokê esîra Berzanî û Telabanî dikin. Diewleten Ewrûpa serokê esîran vewwendî (dawet) dikin û hinek pera didin wan li bo eşkere li dijî têkoşîna rizgariya welatê me derkevin. Diewleten Ewrûpa û Amerîka pera didin serokê esîren kevneperek, daku gel birçî bihêlin û car caran tişekî bidin wan û pêşketina ramyari û daxwaza azadiyê a gel hêdi hêdi were rawestandin. Ma gelo diewleta Tîrkiye wisa ji Kurdistana Başûr re bi rî dike? Li Kurdistana Bakur Kurdish qir dike û li aliye din xwe bi mîlyaketi û mîrovparêz (humanist) nîşan dide. Ev planen Counterinsurgency ne."

-Wê bidome-

GOTİN

Yaşar Kaya



Rewşen Saleh Bedirxan

Ez ji Diyarbekirê vege riyan hatim İstenbolê, çûme O茲gur Gundemê. Hevalen ku Welat derdixin zehf nazik û kîbar in. Roja ku Welat derdikeve ji êvarê ve ji min re tînin, ez ne li oda xwe bîm ji, li ser masa min dihîlin û dicin. Ez çawa hatim, min li rüpelên Welat yê pêşî nihîri, wiha digot: "Rewşen Saleh Bedirxan çû ser heqîya xwe." Ez gellek ber xwe ketim, dilê min şewîti. Lî belê çend sal û çend meh bûn ku min tiştekî wiha dabû ber çavê xwe. Ez wisa texmîn dikim Rewşen Bedirxan 93 salî hebû. Li sûriye, li bajare Lazkiye rûdinişt. Deh-panzdeh sal berê, sê-çar salan li pey hev hatîbû İstenbolê. Dihat mala xwişa

Kamûran Bedirxan, Meziyet Çinar. Min du car zarokê xwe ji bi xwe re bir çûm ziaretiya wê. Wi çaxî Bêrîvan û Dara biçûk bûn, bi kurdi hinek kilam û stiran jê re gotin, zehf kîtxweş bû.

Dayîkeka Kurdish bû, porê wê çil û sıpî bûbûn, mîna zarokên kurîn porê xwe "ala garson" dibîrî, te digot eynî pîrekeke, Fransî, an ji Ingîlîz e. 5-6 ziman dizanibû. Pîreka Mîr Celadet Bedirxan bû, li dînyayê gellek geriyabû. Ku ez bêjîm min di ser wê re, bi terbiye, tore û diplomat nedîtiye, ne derew e. Zehf bi aqil û bi mêmî bû. Çûyîna deveran pirr rind dizanibû, zana û diplomat bû. Di konferansa "Bandung"ê de seroka delegasyona Kurd bû. Ji min zehf hezdîkir. Wan salan di gurçikên min de kevir hebûn, ez gellek nexweş bûm. Çû Almanya hat ji min re telefon vekir, got: "Yaşar kurê min ê delal, were ez te bibînim, lî belê min ji te re diyariyek biçûk anîye, ezê wî ji bidim te." Ez rabûm çûm. Kurê wê Cemşit, li Almanya Urolojist bû Jê re dibêje halê Yaşar wîha ye, ew ji ji min re dermanekî dişine. Min ji digot qey ji min re

diyariyek din anîye, wek qrewat, kiras..û hwd. Ez çûm min destê wê maçi kir, min nihîrt ku derman ji min re anîye, ez zehf şâ bûm. Gurçikê min bi wan dermanan pak bû. Hê ji ji wan dermanan li malê hene.

Qet vala nedisekinî, biçûya kîjan malê, bi desten xwe tiştan hazir dikir û bi xwe re dîbir. Ji min re digot: "Lawo, êdî ez pîr bûm, wexta apê we sax bû, me diçû ji gundan zarokên Kurd dihanî mala xwe. Zarokên min mezîn bûbûn û çûbûn Ewrûpâye, Ünîversîte dixwendin, min li mal wan dida xwendinê, li ser masê, bi kîr û çetelan xwarin çawa tê xwarinê hîni wan dikir, min wan li trêne suwar dikir, li bajareñ mezin digerand, min digo bila dinê bibînin. Min û apê te, bi vî rengî gellek zarok da xwendinê.

Rewşen Bedirxan dayîk bû, xwişk bû, heval û hogir bû, hosta û mamoste bû. Ji malbata xwe bigre heta hevalen Mîr Celadet Bedirxan gellek giregirêne Kurdish nas kiribû û bi wan re jiya bû. Jiyana dayîka Rewşen wek tarîxek bû. Ew ji çû ser heqîya xwe, rehma xwedê lê be.

Şerê nav Turkeş û sosyal demokratan

MHP ya doh û MÇP ya frô bê deng û bê his e. Belê di bin re karê xwe dike û giş daîreyen stratejik dagîr kirine.

Bi hezarın hevalbend û tereftarîn Turkeş ketine daîre û meqamên wezaretên dewletê.

Fikri Sağlar Wezîrê Kulturê ye. Di wezareta Kulturê de zilamên Turkeş zêde hene. Haya Fikri Sağlar ji vê heye û di bin blokajeke xwirt de ye. Fikri Sağlar pîr bi ihtiyat û hêdî dixwaze ji van kadroyan qismekî jê biguhere.

Wezîrîya Fikri Sağlar ji zû de û ji serî de li hesabê



Turkeş û nîjadperes û faşist nayê. Niha Fikri Sağlar raserî çavên xwe kirine û ji bin de li ketina wi digerin. Haya Partiya Demirel, DYP ji vê heye û ev plan li hesabê wan jî tê. Ji xwe di dema ku Fikri Sağlar butça Wezareta xwe pêşkêşkiribû, butça wî bi rayen partiya Demirel nehatibû qebûlkirin.

Wezîrîki Partiya Demirel û şîrîkî partiya Fikri Sağlar vê dibêje: "Ne niha, belê meheke din wê hin kes ji hikûmetê bê avetin. Wê di hikûmetê de hin guhertin bibin. Belê ji niha ve ez karim vê ji we re bêjim ku ava serê Fikri Sağlar

li kelê ye. Fikri Sağlar xeletiyen mezin dike. Kadro û memûren wezaretê diguhere. Herkesî davêje. Heyfa wan kesan, guneh e. Ew giş mirovîn nasyonalfst û tirkrest in, tev ji me ne. Heta bi xizmetkarê odan davêje."


MÇP yî jî vê dibêjin: "Me ji bo avêtina Fikri Sağlar bi Demirel re soz û peyman çekirine. Ne em bi tenê, belê DYP yî jî ji Fikri Sağlar ne xwes in."

Ji DYP'ê yekî din: "Ez Demirel nas dikim, ez ya dilê wî dixwînim. Wê hikûmetê biguhere. Ev guhertin dê zêdeyî texmînan firehtir bibe.



Turkeş û Sağlar

ji Fikri belê ji emelê wî em ne razî ne. Mirovekî bi hurmet e, gava ku serokê me Alpaslan Turkeş dibîne ji pêncî metro-yî bişkokêñ xwe digire. Em ji Fikri memnûn in, belê ji fikarêñ wî aciz in."



2000 polîs girte ser çend hezar mirov

Hefteya çûyî serê sibehê 2000 hezar polîs girte ser taxeke İstenbolê. Navê vê taxê Küçük Armutlu ye.

Taxa Armutlu nêzîkî 20 salan e ku hatiye avakirin û bê xwedî û xezan e li İstenbolê.

Di wextê operasyonê de di nav polîsan û xelkê de ser derket, birfîndar çêbûn û hin kes jî hatin girtin.

Polîs yeko yeko li malan geriyan. Serokê Emniyeta İstenbolê Nejdet Menzîr ji

rojnamevanan re wiha got:

"Em dê li vir ji bo demeke wextî ji bo xwe mekteban bikin bargeh û warê seknê. Berî ku mekteb vebin em dê li cihekî minasib qereqolekê ava bikin. Em divê xelkê vê taxê ji bela rîexistinê siyâsî rizgar bikin."

Li ser pirsa rojnamevanekî Nejdet Menzîr ev jî got: "Çend tax û mehelen din jî hene wek vê taxê. Li pêş emê wan taxan jî saff bikin."

Li gora xelkê Küçük

Armutlu "Polîs rast nabêje, derewan dike. Ji bo ku belediye li vir tu xizmetê neke û taxa me bi temamî xera bikin ev operasyon çekirin. Me heta niha bê hejmar car dawe li belediye û meqamên dewletê kiriye ku xizmetê bînin taxa me, belê kes naxwaze serê xwe bi me re bêşîne. Dewletê em ji bîra kire û bi ser de jî niha mahnan çedike da ku xaniyêne me bi ser zarok û malen me de hilwesîne."

Me lêxistin û felâqe navê

Xwendevanêñ lise heqê xwe dixwazin. Li hember lêxistin û zora mekteban in. Xwendevan dixwazin xwedî heqê xwe, gotina xwe bin. "İdare mekteban li me bi çavên mirovan nanêre." Xwendevanêñ liseyên Özel Şenol, Özel Işık û Haydarpaşa Meslek lisesi kampanyeke ûmzeyan vekirine. Heta niha ji hejmarek lise li dora 400 xwendevanî besdariya vê kampanyayê kiriye û ûmzeyen

xwe avêtine binê wê. Bi navê xwendevanen Sibel Öz û Özel Işık vê dibêjin:

"Li Tirkîye xwendegah bûne şîrketen bazırganî û ticaretê. Xwendegah û xwendevan di bin zoreke mezin de ne. Xwendevan kirine robot, kirine mirovîn ku naflakirin. Xwendevan çavgirtî ne û fêrî staeta bi Quranî bûne. Zoreke xerab li ser me heye, ev zor gerek rabe.

Xwendevanêñ lise (bekelorya) Yavuz Işık jî vê dibêje: "Pişti salen 80 an idareyên mekteban xwendevanen lise apolitîk û pasîv kîrin. Em vê rewse nema qebûl dikin, em dê li hember vê neheqiyê derkevin û em komik û civatêne xwe damezinin. Xwendevanêñ liseyân divê ji yê unîwersîstan jî zûtir xwe bidin hev û komelêne xwe çekin, lewra li xwendegahen lise zor girantir û mezîr e."

Pirtûka weşanxana Beybûn ya yekemîn hat komkirin

Qedexekirin û komkirina neyek berî demeke kurt vebû pirtûk, kovar û rojnameyan û dest bi weşandina pirtûkan domdike. Roj tune ku pirtûkek an jî kovarek neyê civandin, roj tune ku nivîskarîn pirtûkek an jî berpirsiyare weşanekê ji ber raman û fîkrîn xwe dermekeve daghehê.

Ji bo ku pirtûk û rojnameyan serbixwe neyê xwendin, ci ji destê dewletê tê dike, her cure astengî ji wan re derdixe û rê li wan digire.

Bi navê Beybûn weşanxa-

neyek berî demeke kurt vebû kir. Bes pirtûka wê ya yekemîn hate komkirin. Li ser vê astengîa ku dewlet ji weşanxanê re derdixe, Midûrê weşanxana Beybûn, Ibrahim Kureken wiha peyi: "Weşanxana me hêj di gava xwe ya pêşî de rastî qedexeyan hat. Pirtûka Ekrem Cemîl Paşa ku bi navê "Muhtasar Hayatîm" ji teref weşanxana me ve hate çapkirin pirtûka me ya yekemîn bû û hat komkirin.

Meşa memûran

Hefteya din li Enqere memûran ji bo mafênen sendîkayî û grevan mitîngîk li dar xistin. Pişti bi çend rojan roja sêsemê zêdeyî hezar memûr bi dû meşeke çendrojî de xwe gihandin Enqere. Li Enqere ji hawîrdor xebatkar û memûr ketin nav meşê û hejmara memûran ji 10.000 an derbaskir. Berî memûr têkevin Enqere li Sincanê polîsan erebêñ memûran sekinandin û di nav memûr û polîsan de ser derket.

Di şer de gellek memûr û beşdarîn mitîngî birîndar bûn û hin kes jî hatin girtin.

Di mitîng û meşa memûran de çend mebûsîn SHP'ê û Mebûsîn Partiya Keda Gel Mahmut Alînak û Orhan Doxan jî amade bûn.

Mebûsî SHP Salman Kaya ev got: "Ez jî di nav de li dora 300 kesî heqaret xwarin û dehf û pêhn dîtin. Serê hin kesan şikest û polîsan bi copan li hin kesan xistin."

Memûran dewlet protesto kîrin û di nav sloganên wan de ev jî hebûn: "Ma ne bes e ji terora dewletê re."

Mitîng û meşa ji İstenbolê heta bi Enqere ji 52 sendîkayîn memûran hatibû saz kîrin.

Li Başûrê Kurdistanê televizyona kurdî

Kanalên televizyona kurdî dîbin çar. Heta niha televizyona kurdî bi du kanalan weşan dikir. Niha dîbin çar kanal. Kanalên ewil yên yekîtiya Nişîmanî û Partiya Demokrat û Kurdistanê İraqê bûn. Niha li van herdû kanalan kanalên Samî Abdirehman û Partiya İslâmî jî zêde dîbin.

Kanalên yekîti û ya partî rojê 7 saetan bi kurdî û erebî program çêdikin. Televizyon bi xwendina quranê dest pêdike. Programên televizyonê bi pirranî xeber û şîrove ne. Filîm bi pirranî tîrkî û erebî ne.

EKREM CEMİL PAŞA

**MUHTASAR
HAYATIM**

KEMALİZME KARŞI KÜRT AYDIN
HAREKETİNDEN BİR YAPRAK

Beybûn Yayınları

Avahiyeyeke neteweyî: HEVKOM

• İro li Kurdistanê malek nemaye ku kes jê nehatibe girtin an şehîdîrin. Dijmin, dixwaze şer bike şerekî sivil û berê xwe daye gel ku qir bike. İro di zîndanan de cih nema ye. Ji ber vê yekê çepera xebata HEVKOMê roj bi roj fireh dibe û li tevê welat, ji her derdorêñ kesêñ ku mirovên girtiyan an şehîdan in, bi HEVKOMê re dixwazin têkiliyan çêkin û alîkariya wê bigrin

Şervan

HEVKOM; bi armancıa nasdaña doza mafdar a kesêñ ji bo Kurdistanê şehîd ketine û bûne dîliyên di destê dijminan de, herwiha bi armancıa hevgirtina di navbera malbatêñ şehîd û girtiyan de, di meha yekemîn ya sala 1991 an de hatiye damezirandin û ji wê rojê heta iro ji bo mafêñ mirovatiyê ya gelê Kurd kar û xebatê dike. Ji ber ku şertêñ li welat ji bo avakirina komeleyek wiha ne rind bûn, ev komele li derveyî

îşkencyan ji aliyeñ canî û giyanî bigîhîn saxiyêñ xwe, xebatê dañîne pêşıya xwe.

HEVKOM; parastin û perwerdekirina zarok û jinêñ li Kurdistanê, ku ji ber mirovên xwe yên şehîd û girtî bûne rûberê pîkoliyên dewletêñ dagîrker û ziyan (zirar) girtine, xebatê ji xwe re delamet dizane.

HEVKOM; dûvetina li gora hoyen navnetewyan birêvebirina cengê li Kurdistanê, xebata di pirsa gelê sivil de ku ji ber êrîşen dijminan

mirovêñ dixwazin hevkariya gelê Kurdistanê bikin e.

HEVKOM wek ku me li jor armancêñ damezirandina wê rînişan da, li ser van armancan ev zêdeyî salekê kar û xebata xwe didomîne. Di nava vê kar û xebatê de derkete ber çavan ku xwedîderketina malbatêñ şehîd û girtiyan incax bi xwedîderketina gelê Kurd dikare pêk bê, ji ber ku dewleta dagîrker pîkoliyên xwe li ser her kesêñ Kurd dike. İro li Kurdistanê malek nemaye ku kes jê nehatibe girtin an şehîdîrin. Dijmin, dixwaze şer bike şerekî sivil û berê xwe daye gel ku qir bike. İro di zîndanan de cih nema ye. Ji ber vê yekê çepera xebata HEVKOMê roj bi roj fireh dibe û li tevê welat, ji her derdorêñ kesêñ ku mirovên girtiyan an şehîdan in, bi HEVKOMê re dixwazin têkiliyan çêkin û alîkariya wê

mirovahiyê xwedî derkevin.

Wek ku tê zanîn neheqî û qirkirinan ku li ser serê gelê Kurd dike, ji aliyeñ dewleta Tîrkiye û rojnameyên tirk tên veşartin û rast nayêñ ser ziman. Di vî warî de HEVKOM bi riya têkiliyên xwe yên bi gel re rastiya van derdixîne der û bi cihanê dide nasdan û li ser mafêñ wan disekin.

Li derveyî welat û bi pirranî li bajarêñ Ewrûpa têkiliya HEVKOMê bi gellek avahiyêñ mafdarêñ demokratikî û mirovahî re heye. HEVKOM bi riya van têkiliyan dengê gelê Kurd digihîne derveyî welat û li dergeha van avahîyan li mafêñ van mirovan dipirse. Her roj têkiliyên xwe yên di vî warî de xwirtir û firehtir dike ku karibe berhemekê kom bike.

HEVKOM di xebata xwe de arşîvek dewlemend ava dike. Di vê arşîve de nav û sûretên şehîdan û navnîşanen malbatêñ wan heye. Gelek malbatêñ şehîdan, ji HEVKOMê dikarin sûretên şehîdîn xwe bigrin, an di derheqê şehîdbûna wî de zanebûnê bigrin an ji bi alîkariya HEVKOMê jiyanâ mirovên şehîd di rojnameyan de bînin ser ziman.


Li derdorêñ Kurdistanê berpirsiyaren HEVKOMê di

Kurdistanê qirkirinan dîkin (wek Newroza îsal), HEVKOM li gellek bajarêñ Ewrûpa civînan, semîneran, roportaj... li ser van bûyeran çedike û di derheqê zilma dijmin û rewşa gel de naskirin dide.

Bi pirrayî welatparêzên li bajarêñ Ewrûpa dijîn alîkariyeke xwirt didin HEVKOMê û

HEVKOM vê alîkariye digihîne malbatêñ şehîd û girtiyan. Wekî din HEVKOM şevê bîranîna şehîdan saz dike. Gellek kesêñ welatparêz di van şevan de têne cem hev û bêşa maddî û giyanî (manevî) dîkin. Şeva bîranîna şehîdan a yekemîn li bajarê Hannoverê îsal pêk hat. Di vê şevê de zêdeyî 7 hezar kes kom bûn. Ev kombûn di nava Kurdish de têkilî û baweriye xwirt ava dike. Yekîtiya gelê Kurd û hevgirtina gelê Kurd xwirt û bilind dike. Pereyêñ ji van şeva kom dibin bi destê HEVKOMê li malbatêñ şehîd û girtiyan belav dibe û ev ji di nava gel de nîşan dide ku gelê me ne bêxwedî ye û bi vê gel hîn bêhtir bi şoressê ve tê girêdan.

Gellek mirovêñ ku dixwazin alîkariye bi malbatêñ şehîd û girtiyan re bikin bi riya nameyan an bi telefonan li



**Gîrsêñ gel
di şeva
HEVKOMê
de ji bo
bîranîna
şehîdîn
Kurdistanê
tev bi hev
re û bi yek
dengêki
baweriya
xwe tînîn
ziman**

welat li Almanya, bajarê Boxim (Bochum) ê hate damezirandin, lê bi xebata xwe ya kûr û fireh destê xwe dirêji her derdorêñ welat kir û heta iro xwe gîhandiye pirraniyê malbatêñ şehîd û girtiyan û wekî din di nava Kurdêñ li Ewrûpa û cihanê belav bûne de ji xebatek girîng û hêja dike.

HEVKOM; di bermameya xwe ya damezirandinê de bingehê xwe wiha rînişan dide:

HEVKOM; bê ku cudahiye di navbera çar parçeyêñ Kurdistanê û partiyêñ li Kurdistanê bike, xwedî li hemû kesêñ ji bo Kurdistanê şehîd dikevin, dibin dîliyên di destê dijminan de û malbatêñ wan derdikeve.

HEVKOM; alîkariya malbatêñ şehîd û girtiyan ji aliyeñ daringî (maddî) û giyanî (manevî) ji xwe re delamet dizane.

HEVKOM; xebata di riya pirsgirêk û divêtiyêñ girtiyan di zîndanan de û şopandina

îşkencyan û tewanêñ li hemberê mirovahiyê yên din, ji xwe re delamet dizane.

HEVKOM; ji bo gorîyê

dikeve nava rewşekê perîşan û pêkanîna pêdiviyêñ wî, ji xwe re delamet dizane.

HEVKOM; girêdayî bi armancêñ damezirandina xwe ve, di qada navnetewyan de pêwendiyêñ bi rîexistina Xaca Sor "Amnesty International-Al" rîexistinê mafêñ mirovan, saziyêñ olî (dînî) û berpirsiyaren wan re, angò bi sazî û kesêñ xebatêñ civakî û mirovahî dîkin re, ji xwe re delamet dizane.

HEVKOM; saziyeke girseyî û demokratikî ye.

HEVKOM; bi armancêñ mirovahî damezirî ye.

HEVKOM; rîexistineke her kesekî ye, ku bê cudahî di navbera birêñ welat û partiyêñ li welat, xwedî li Kurdistanê, şehîd û girtiyan vî welatî derdikeve.

HEVKOM; rîexistineke her kesekî ye, ku bê cudahî di navbera welatan û netewyan de, xwedî li mirovan derdikeve û xebata ji bo mirovahiyê daniye pêşıya xwe.

Xwedî derketina li HEVKOM, xwirtkirin û nasdana wê, delameta hemû mirovêñ ji Kurdistanê û

bigrin.

Ji ber ku dijmin, bi zordestiya xwe welat li gel kiriye zîndanek cehenemî, gelek mirovêñ Kurd ji welatê xwe dûr ketine û li metropolên Tîrkiye an li yên Ewrûpa belav bûne. Gelek ji van kesan ji zilma dijmin dîstine, yan di zîndanan re derbas bûne, yan mirovêñ wan di zîndanan de hene û yan ji xwediye şehîdan in. Ev kesêñ wiha ji têkiliyên xwe dixwazin bi HEVKOM re çêkin û bi alîkariya HEVKOM li mafêñ xwe yên

nava gel de hene û ew her roj

ji Komeleya Merkezi ya HEVKOM re malûmatêñ bi xebata wê ve girêdayî dişinîn û wekî din resim, film, wîdeo, kaset an dokumantêñ di derheqê qirkirin, malixerakirin, talankirin, şewitandin, îşkence, zilm, sîrgûn... hwd. kom dîkin û dişinîn. Ev dokumantêñ ku tê HEVKOM, li vir nushayek dikeve arşîve û yên din li gora girîngîya wan li cihanê têñ belavkirin, di vî warî de propagande û nasdan çê dibe.


Dema ku dewletêñ dijmin li

HEVKOM dîgerin û di vî warî de zanekirinê dixwazin. Kesêñ ku bixwazin alîkariye bikin, numere ya konto ya HEVKOM ev e:

HEVKOM, SPARKASSE BOCHUM, KONTO Nr. 14-31-70-900 BLZ: 43050001

Telefon a HEVKOM (ku ji Tîrkiye an ji Kurdistanê bigerin) 49-234-54 12 45

Navnîşana HEVKOM: VON GALL STR.2 4630 BOCHUM 1 RİEMKE DEUTSCHLAND (ALMAN-YA)



**Di şeva
Hannover
de koroya
HEVKOM û
bi hezaran
kesêñ
Welatparê
z bi hev re
Marsa
Neteweyî ji
dil û can
gotin**

Dayîkeke kezebşewitî, dayîka Kurdistan Hindo:

'Şoreşa Kurdistan jinê diguherîne'

● Weke her dayika Kurd bi malbata xwe ve min ji nesibê xwe ji kotekiye dewletê standiye, lê ez bi vê yekê ne poşman im ez şanaz dibim, ger min nesibê xwe ji kotekiye dewletê ne standiba minê ji xwe fihêt bikira, min ne xwe nasdikir û ne ji neyarê xwe ez bi vê yekê hêj gestir, bi serkeftinê xemilandî, bi bawer û xwedî rûmet bûme...

● Hoya em negihîne heq û mafêx xwe, em negihîne serxwebûn û azadiyê, emê kole û reben bin, lê dilê min bi vê yekê zehf xweş e. Gelê me iro li dijî vê zilm û kotekiyê rabûye ser piyan, ez bi vê yekê dikevime govendê û dîlanê dikim. Zarokên me bi mîranî rabûne ser piyan ez bi vê yekê gellekî şanaz dibim. Ez herime goristanê ji ez çav girtî naçim.

Dayika Hindo, tu çend salî bindest ê zilamê xwe bûn, ji ber vê yekê ji, ji bûyerên cihanê serwext nînbûn.

-Kurê min salê emrê me ne weke mirovên serbixwe ne, meh û salên me ne hatiye kifş kirin, lewra dîroka me nehatiye nivîsandin ji hezar salan ve em kole û bindest in, em di navbera xwe de dibê "filano di dema Berfa Sor de hate dinê, bêvano di wexta ku Ingîlîz ketin Kurdistanê, an ji di wextê Serhildana Şêx Seîd, Simko, Rewandiz, Zilan û Mehabadê de ji dayika xwe bûne. Bi kurtayî lewma di dîrokê de tiştekî me nehatiye nivîsandin em salên xwe ji rind nizanîn, lê ez texmîn dikim min teqrîba 50 salî kîrî ye.

Tu li ku derê dijî bi kurtasî tu dikarî ji me re behsa jiyana xwe û malbata xwe biki?

-Berîya 7-8 salan ez li gundekî Nisêbinê dimam zilamê min berîya 23 salan bi eşâ zirav ket û mir, ez li ser zarokên xwe sekinîm min dev ji wan berneda. Li gund jiyana me bê mical dihate domkirin, tiştek di destê me de tunebû ku ez zarakan pê xwedî bikim ji ber vê yekê me berê xwe da bajare Mîrsinê.


Berîya serê çekdarî ku li Kurdistanê dest pê bike jîyan û rewşa jîna Kurd çawa bû, iro tu çawa dibînî?

-Kurê min, ma berîya şerê çekdarî jîyan û rewşa jîna Kurd çawa bû, iro tu çawa dibînî? -Weke her dayika Kurd bi malbata xwe ve min ji nesibê xwe ji kotekiye dewletê standiye, lê ez bi vê yekê ne poşman im ez şanaz dibim, ger min nesibê xwe ji kotekiye dewletê ne standiba minê ji xwe fihêt bikira, min ne xwe nasdikir û ne ji neyarê xwe ez bi vê yekê hêj gestir, bi serkeftinê xemilandî, bi bawer û xwedî rûmet bûme...

Ji malbata we mirovên şehîd an ji girtî hene?

-Bê hesab e. Di sala 1991 an de li herêma Mîrdin li navçeya Nisêbinê birayê min Zerdeş, pismamê min Salih

Dema
ku ez li
gundê
Kurdistanê
bûm ev
zilm min
dit, iro li
Mîrsinê ji
kotekiyê li
me dikin,
her roj
digirine
ser malen
me tu
hizûr ji me
re nehiştî
ne



Dayîka Hindo (î allyê çepê) di greveke birçibûnê de.

ü Smaîl şehîd ketin. Di sala 1990 an de li Iraqê Ahmet Abdulkerim, Mahmut Xelîl û Ibrahim Xelîl li girtîgehê faşistî Sedam her sê pismamê min bi kotekiyê qetilkirin, sala 1990 an de li Bexdayê Osman Hisen, Ahmet Hemdîn û Ahmet Hiseyn leşkerê Sedam mekîne li van her sê pismamê min qelibandin, qetilkirin. Kurê min ma ezê ci ji te re bêjim, ezê ci nebêm, kul û birfînîn min giran in û xelas nabin, lawo xwedê zilm û kotekiye dewleta Tirk û Ereban bi ser kesî ve veneke.

Dema ku ez li gundê Kurdistanê bûm ev zilm min dit, iro li Mîrsinê ji kotekiyê li me dikin, her roj digirine ser malen me tu hizûr ji me re nehiştîne.

Ev kotekiyê tu dibê heyani kengê wê dom bike?

-Heya em negihîne heq û mafêx xwe, em negihîne serxwebûn û azadiyê, emê kole û reben bin, lê dilê min bi vê yekê zehf xweş e. Gelê me iro li dijî vê zilm û kotekiyê rabûye ser piyan, ez bi vê yekê dikevime govendê û dîlanê dikim. Zarokên me bi mîranî rabûne ser piyan ez bi vê yekê gellekî şanaz dibim. Ez herime goristanê ji ez çav girtî naçim.

Li metropolê jîyan û rewşa pîrekên Kurd tu çawa dibînî?

-Lawo, ma wê rewşa û jiyana me çawa be, hew bi nav tenê tê gotin jîyan, mirovê bindest û kole be ew ji ku zane jîyan ci ye kurê

min, me jiyan ne dîtiye heyanî ku em zanîbin bê jiyan ci ye, lê belê rewş diguhere, pêşketin çedibe, em Kurdên li metrepole li hev dîbin xwedî, li hev pirs dikin û di tifaqê de ne. Wekî din ji bi rastiya xwedê em li bajaren Tirkan cêrîtu, rîncberî û xulamtiya dewle mendê Tirkan dikin. Zikekî têr û dehê birçî em rojên kotekiyê derbas dikin.

Yanî tu dibê dewlet ji berê ve kotekiyê li her mirovî dike?

-Na, na kurê min dewlet kotekiyê li mirovên bi rûmet, li mirovên welatparêz dike. Dewlet wê çima kotekiyê li mirovên weke xwe bike, dewlet, wê çima kotekiyê li sixûr, dehşik û yên xwe firotî bike?

Ji bo ci hûn li welatê xwe najîn, sedemê getandina gelê Kurd ci ye ku derketine metrepole?

-Weke ku min anî ziman em ji bêmecâli derketin kurê min. Li Kurdistanê cihê kar û xebatê kirine lêdanxane.

Li pêş de hûn dixwazin vegerine welêt?

-Çawa em naxwazin kurê min, bi serê te bi sev û roj, bi kîlî û saetan çavê min li riya welêt e, kezeba min şewitiye. Gelê Kurd tev dixwaze ku di demek nêz de em vegerine welêt, ez bawer im ku ew roj ji nêz e...

Tu get ketiyî rojiya birçibûnê?

-Belê.
Kengê, çend caran, ji bo ci?

-Ez sê caran ketim rojiya

birçibûnê, her sê caran ji li bajare Mîrsinê, cara yekemîn 7 rojan ji bo hîsîren şoreşê bû, cara duyemîn 9 rojan domkir ev ji li hember rîknê 125 a bû ku ji ser hîsîren şoreşê were rakirin, ya sêyemîn ji li dijî koçkirina hîsîren şoreşê bû ku koç kirin girtîgeha Eskîşîhîre, 14 rojan ez ketim berxwedanê.

Mirovên di berxwedanê de ji jîn û mîran kîjan pirrbûn?

-Di destpêkê de mîr di berxwedanê de ji me zehftir bûn, lê di berxwedanê sêyemîn de me da pêsiya mîran hejmara me ji wan pirtir bû.

Tu bêtaqetbûna birçibûnê bi te re çêbû?

-Ez qet bê taqet neketim û xwarin nehatê bîra min. Èsîren şoreşê di bin darê kotekiyê de bin û bila birçibûn were bîra min, ma qey ez ji wan çêtir im, bila canê min bîbe gorî wan...

Mîrin ne dihat bîra te yanê tu xofa mîrinê bi te re çênebû?

-Ev ci gotin e, kurê min, bi serê te heyanî iro ji mîrin nehatiye bîra min û ne di bal û xeyala min de ye.

Tu xwestinê te ji rojnameya Welat hene?

-Ez gelekî şannaz bûme, ez dibêjim ince bi zimanê xwe mirov karibe kul û birfînê xwe bîne ziman, Rojnameya Welat valahiyek gellek mezin da dagirtin, ez gellek silavê xwe yên germ û ji dil ji nivîskar û xebatkarê rojnameya Welat re bi rî destê pêxember li pişta we be kurê min.

Hevpeyîn: S. Arjen

Çare ci ye?

Dilbixwîn


Em ji çareyê ve destpê bikin... Çare ci ye? Ew çareya ku ev 4 hezar sal in me xwe di nava çarçova wê de fetisandiyê û li hember biryaren wê yên hovane destgirêdayî û çavşikestî mane. Ew çareya ku hinekan jêderâ wê bi jor ve girêdîdan û digotin: "Wilo li ser eniya me hatiye nivîsandin, divê em xwe bitewînin, piştä xwe xûz bikin û bipejirîmin." Wey li min û vî "bextê reş"! Me çîma wilo xwe

dixapand, bi xwe dikenîyan û histûyê xwe didan bin kîreke tûj, ku hinekan di bin gelek navan de em pê şerjê

dikirin, ji bo ci em di dîrokê de bûbûn û bûne berxê ber kîrê?!

Dîroka me, destaneke diramatîkî ye. Li aliye kî lekeyen xwînê li ser kevir û zinarê pêdar, li aliye kî stem û stemkariya axa û begê hevxebatkar, ên ku ji bo


nîşana bêrûmetiyê bi singa mîna maran di erdê re dixuşî xwe ve daleqînîn û sultanê yan, riswa dibûn û heyvî ji Osmaniyan û mîrîn Erebân şerman re xwe di bin enîşka razî bikin, hebûn û nirxên me di bin simên hespê



Wêne: Rebowar Sald

"Tipê Hemîdî" de perçî jan-din, li aliye kî nale-nala dayikê porsipî, yên ku di jiyana xwe de difetisîn û li zayîna xwe poşman dibûn, sîn digerandin, lörîk digotin û pêlîn xwînê li ser her du dêman radibûn û dadihatin... û li aliye kî hawar û fîxana keçikê bedew, ên ku gulfî

gelek in, bêyî hukumdariya we em nikarin' xwe idare bikin..." tê ci wateyê? Ne tenê ev; Yadîgareke din ji pêşkêşî Sultan dike, pirtûkekî bi navê Heşt Buhûst dinivise. Di wê pirtûkê de pesnê heşt Siltanê Osmanî dide. Edî hefsarê me da dest Siltanê



Idris Yıldız

Zincîra koletiyê

Ey gelê Kurd de rabin dest bidin hev
Çavê xwe vekin
Ji vê xewa bênamûsî şîyar bin
Van canfeda û şehîdan bibînîn
Mahmut, Xelat, Amed, Lokman, Serhat,
Hogir, Veysi, Tewfik
Nisêbîn bi xwînâ xwe avdan
Rê pêşme kirin rabin bidin pey şopa wan
Zincîra koletiyê bişkînîn
Wext wextê serfiraziye ye, wextê azadiyê ye
Em we tu cara ji bîr nakin
Hûn di dilê me de ne
Hûn şerîn ciya ne, hûn gulên Kurdistanê ne.
*Ji Nisêbînê xwişka hevalê Mahmut
Leyla Yıldız*

berber, ku çend sed sal di ser wan re derbas nebûbûn dema ji lawir û heywanan hatibûn qetandin. Belê di dema hovîtiyê de jiyan dibûn, tevî ku koçber gihiştibû feodalizmê ji. Em dirêj nekin, çendî dirêj bibe wê ewqas bêhna genî jê we re. Dewleta Tirk ji (ya niha) zora Siltanê Osmanî ji xwe re kiriye çeka desthelatiyê.

QEDER

Wey mala wê qeder û çareyê bisewite! Dînê me yê Zerdeşti bi darê zorê ji dest me girtin û pelixandin û em kîrin misilman, me got li ser eniya me hatiye nivîsandin qeder e. Osmaniyan û Sefewiyan li ser xaka welatê me şer kîrin û xwîna me rijandin, me got qeder e. Kurdistan di Qesra Şêrin de kîrin du perçê (1639) me got qeder e. Bi dehan qirkirin û kujtargeh bi navê dîn, êl û nijadan li dijî me bikaranîn me got qeder e... û Kurdistan kîrin çar perçê û li her perçeyekî kesbûna me di bin piyan de hênciqandin, em kîrin Tirk, Ereb... û Faris, dîsa me got" Ev qeder e! Na, na..! Eger ev çare û qeder be, sed nifir û nifrîn lê we re.

CARE TEKOŞİN E

Edî baz di qefesê hilnayê, divê wê merbenda nemerdîyê ku heya niha li dora histûyê wî hatiye gerandin biqetîne û bi azadî her du baskan li ba bike.

Karwanê azadiyê dest bi rêveçûna xwe kiriye. Çeka tolhildana salan hilgirtiye, lêdide, lêdixe û rûyê dîrokê yê reş diperitîne. Xwîn xwe di çavêne me re davêje, nema dil xwe li ber sînorê sebir û hedarê disekinîne. Kesênu nîzanînan nan bixwin ji, bûne xwedî dewlet û alêwan di nava alan de pêl didin, wiha nabe, ev e me çeka xwe hilgirtiye, ci bi zorê, ci bi aştî, hestiyêne me rizîn bes e! Gelo, ji vê bêrûmetiyê bêhtir?!

Çare ci ye? Em gelekî doş bûn, me li gelek deriyan xist, em ji gelek kesan re jî bûne azep û xulam, dîsa ji me çare ji vê derdê xwe yê giran re nedît. Ji lewre em xwe bi rext û fişekan dixemilînîn, çavekî dadigirin, nîşan dikin... Kuleh û şebqeyen mehmetçikan difirînîn, mafê me ye, em dixwazîn welatê xwe paqîj bikin... êrifî dikin û dibêjin: "çare ev e!"


XÂÇEPÎRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeberast:

1-Pêşnavê
damezrand
vanê Elfaba
kurdî
latînî,
wêne de tê
dîtin/
Mizgeft
Ereb
mîran
dibêjin/
Birayê
dê, ne
bav
Celebekî

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12



gore, ji çerm/ Kinca ji bo
baranê 4-Erd, cih, war/
Hatina ji kirê 5-Ol/ Sembo-la Rûbîdûmê/ Yan, yaxût/
Heta, heya 6-Bi zimanê
biyanî tevger, liv 7-Sembo-la Sodyûmê/ Pêşkêş 8-Banga ga 9-Celebek
enstrûman ya bi nefes/
Cîlwe 10-Cihê ka lê tê
dagirtinê/ Sembola Selesyûmê

Serejér:

1-Pûşî, egal 2-Navê welate-kî/ Bersiva negatîv 3-

Destûrnameya porvanan/
Pîs, ne rind 4-Namûs/
Tiştêni di iro de, rojane 5-Qerar 6-Celebekî cil ku ji
hirî çêdibe/ Masûre, tişte
ku li ser tayîk an jî qablosu
pêçandin 7-Berhemê rezan/
Kesê xerîb 8-Li Hindîstanê
mîr/Li Tirkîye navê bajare-kî 9-Evîndar, dildayî 10-Serok, fermandar
11-Bi erebî av/ Plaqa Misrê 12-Li
Effîqaya Bakûr navê
qebîlekî, bi piştigiriya
sipyârî êrîşen dijwar û
qetîşam li hember gel dikin


BERSİVÊN XÂÇEPÎRSA HEFTİYA ÇÜYÎ:

Çeberast: 1-Ragihandin 2-Adar/ Sar/ Doz 3-Peron/ Mam/ La 4-Ema/ Arinîn 5-Nîvek/ Hakî 6-In/ Nîv 7-Nûr/ Mî 8-Bon/ Bîr 9-Azîlet 10-Ararat

Serejér: 1-Raperin/ Fa 2-Adem/ Nûbar 3-Garan/ Roza 4-İro/ In/ Nîr 5-Navîn/ La 6-As/ Rev/ Bet 7-Namik/ Mî 8-Dran/ Mî 9-Mî 10-Nd/ Na 11-Ol 12-Azadî

NEQUSKAmadekar
Aram ÇemÊ ku ji xwe re dost be, bi
herkesî re dost e.

Seneka



Turkeş û Ermenîtiya APO

Gurê pîr û nîjadperestê kevin ji Turkeş kêm e? Çima wê Turkeş, berî çend rojan ji hevalbendê xwe re gotiye. "APO Ermenî ye." Xeberdana Turkeş di rojnama Bugün de derket. Li gora ku rojnamê nivîsiye, gurê pîr, wilo gotiye: "Hûn PKK zanîn. Serokê wê, Ermenî ye û navê wî Artûn Agopyan e. Navê xwe guhertiye û kiriye, APO." (Bugün, 14.6.1992)

Ev bû gelek caran ku Turkeş, dibêje: "APO Ermenî ye." Ez dibêjim, Turkeş henekan dike. Ku henekan neke, xurufiye. Ku ne xurufi bûna, digo, "APO Ermenî ye?"

Kanî, ma Ecevit'ê hevriya Turkeş gotiye, APO Ermenî ye?

Gotinê Turkeşê nuh Ecevit, hûn bêtir pere dikan. Gelo çawa bûye, hûn bi ser Ermenîtiya APO venebûye? Bi gumana min wê ji niha pê ve, ew jî li ser vê mesela muhîm bisekine. Ma ci Ecevit

ji Turkeş zanibe ku APO Ermenî ye, wê ew nizanibe? Ev jê re kîmasyek mezin e.

Ez bi xwe ji Turkeş yeqîn nakim. Heta ku Ecevit nebêje, yan jî Ugur Mumcu nenivîsîne ez ji Ermenîtiya APO bawer nakim. Hûn jî li benda Ecevit û Mumcu bisekinin!

Dîsa jî em heqê Turkeş naxwin. Kê ji me zanîbû ku navê APO, Artûn Agopyan e û bi dizîka kiriye APO? Şeytaniyênil wi, bi xwedê, nayênil bîra şeytan jî. Ji bo xwedê rast bêjin; heta niha kê ji we zanîbû ku APO yê Kurdan Artînê Ermenîyan e? Kê zane, bê Turkeş reben çiqas xebitiye ku heta ev rastî tesbit kiriye. Wax, wax, wax... Bi milyonan Kurden bê aqil hene. Ku ne bê aqilbûna, wê heta niha fîm nekirina ku APO, Ermenî ye? Aqilê mîlyonek Kurd nagihe aqilê Turkeş. Vaye Turkeş, rastiyê dibêje; îca hew bidin dû

APO. Turkeş û ê wek Turkeş; ez ji we re dibêjim: Dev ji van çîrok û çîrovanoka berdin. Ji xwe fedî bikin. Hûn mezinên Partiya ne. Ma em ker in, em bê hiş in ku hûn me bixapînîn? Ma Kurd nizanîn ku we Tirkân, li welatê me Ermenî nehiştin?

APO, te bi tiştekî nahesibîne, ji ber vê yekê jî bersiva te û ê wek te nade. Bê guman, ez zanim APO kare heta heft bavikê xwe bihejmêre. Lî gurê pîr, tu nikarî bavikekî xwe jî bêjî. Nîvî Tirk û Kurdan nizanîn bê tu Tirkî yan jî ji Rûma yî. APO û Kurd, ne ji dolê gura ne. Ji bav û kalen xwe Kurd in. Lî ma tu?

Gotinek Kurdan heye, dibêjin: "Ba ji tehtê ci dibe?" Bi rastî tu ne hêja bûn ku em vê nivîsandîn li ser xeberdانا te binivîsîn. Lî ez ci bikim, mirov carna ji mecbûrî goşte mirîşka dixwe.

ya Milet dike, xebata rizgariya me bi paş dixe.

Nandozê modern in, berî casûsek bi dizî diçû Qonsolosê Tirkân li Helebê... lê iro nandoz eşkere diçin Enquerê û tê de cih digrin... Polisîn hikûmeta Tirk jî wan diparêzin... Nandozên iro bi balafiran diçin zikê xwe dagirin... lê têrnabin... ji ber ku çavbirçî ne... îca ew nandoz bûne... Xêr di wan de nema lawê min!

Cûdî

dixwestin. Hingê dayika min ya pîr digot:

-Lawê min, vî cewrikî berde, ew nandoz bûye... xêr di wî de nema!

Nandoz

Em zarok bûn, carna me cewrik ji dêlan digirtin ku em wan li gel xwe bibin ber berxan. Ji wan cewrikî kan carna yek yek hebûn cih û tebat ne dihate wan û çavê wan li deriyê cîranan bû, her li ba me dixwarin diçûn ber deriyê cîranan jî, dûvê xwe dileqandin û xwarin

dixwestin. Hingê dayika min ya pîr digot:

-Lawê min, vî cewrikî berde, ew nandoz bûye... xêr di wî de nema!

İro ku ez li rewşa hinek perçen Kurdistanê mijûl dibim... Cewrikîn nandoz tên bîra min... lê hîn pîstir... ji ber ku nandoziya van kesan ziyanê bi tevahi-

TİR

Musa Anter



Parsek e bi şûr û qertek e

Ez li hikûmeta Tirkîye mama ecêbmayî. Du camiyan İstenbolê yên mezin hene. Nêzîkî hev in. Dibê parsekekî bi qapan wek ku Kurd dibê: "Mal mitirbî ye, lê bejin hakimî ye. Ev parsekî me jî, yekî wiha ye. Gerçi qala gellek eşqiyâyen ciwamîr tê kirin, mesela wek Koçero, ku pere ji dewlemendant distindin û didan feqîran. Ji bo wî parsekî jî bi tirkî dibê: "Ayasofya da dileniyordu, Sultan Ahmet te sadaka dağıtıyordu." Yanî li ber deriyê camiya Ayasofya pars dikir û diçû ber deriyê camiya Siltan Ehmît li feqîran pere belav dikir. Em jî ji yên wiha re dibê: Parsek e, bi şûr û qertek e. Qertek bi kurdi wek mortal tê bikaranîn. Bi tirkî wek vî pirsek din jî heye. Dibê: "Ekmek yoktur yemeye, atla gider sıçmaya." Em van pirsan tînin ser hikûmeta me ya iro. Lawo ma cîma hûn hedê xwe nizanîn. Li Kurdistanê xorîn hêja hene, hêja ne sed û bavekî we. Hîn sîh salî ye şeş lawê wî hene. Lî mala minê, hatina wî ya salewext du hezar dolar tuneye. Tu zanî we ci kir, ji bo ku dinya hemû tinazên xwe bi we bike, rojek yekşemî, li kuçeyen Amerîkayê, ji bo ku hûn di ber re dîziyê bikin, we çû qûna xwe hejand, deh mîlyar perê vî mîlet feqîr xerc kirin. De ka binê bê we ci kir, ez yeqîn dikim ew şest kesen ku hûn çûbûn wir, me wek kolên berê we hûn bifrotina giftlikîn Amerîka we 10 mîlyar nedikir.

Niha jî wezîrekî we heye, xwedê qebûl neke bernavê wî Ergenekon e. Min go Ergenekon hat bîra min. Di tarîxa Çercis Zeydan de alîm dibêje: "Selçûkî dibê wextê ku em ji welatê xwe yê Asyaya Navîn derketin, kûçikekî rê şanî me da." Yanî ne gur e ha. Bila Tirkeş qenc zanibe ku rîberê wî kûçik e, ne gur e. Ergenekon di 24'ê Gulânî de wiha digot: "Ji bo rehetiya dînyayê çiqas lazîmiya ku heye, emê alîkariya Cümhûriyeten Asya Navîn bikin." Ergenekon cardin emê bînin ser pirsek xwe ya pêşîyan. Dibê: Ku destê te bi rûn be, pêşî di serê xwe bide. Ma lawo, tê gi alîkariya wan bikî. Yanî hebek zadê ku li Kurdistanê çêdîbe, tu yê erzan ji Kurdan bikirî û bişînî ji Yecûc û Mecûcan re. Ger hûn ciwamîr û binamûs in, ji bo rehetiya dînyayê û welatê me pêşî alîkariya Kurdistanê bikin. Ma dikeve ser te û hevalîn te ku em birçi bin û genîmî Serê Kaniyê (Ceylanpinar) bişînîn Asya Navîn. Belkî tu karibî bişînî, lê tu yeqîn bikî em jî nahêlin tu rehet bîmînî. Ma ê me em her nerehet in û em hînê nereheti û birçibûnê bûne. Lî sêwîlêkîn wek we, çêlîkîn muhalebiyê emî di bêvla we re bînin.

Afî welatê xwe neke, here afî welatê xelkê bike û dûre jî wek ehmeqan bêje ji bo rehetiya dînyayê em wiha dikan. Ma kî jî we ehmeqtir e, ku jî we bawer bike.

Niha li İstenbolê em di axa Yewnan de ne, divê em hînek ilmê Yewnaniyan yên kevin jî zanîbin. Filozofen Yewnan ên qedîm dibê: "Herkes devê deriyê xwe paqî ke, mehele hemû paqî dibe." Ê ma Ergenekon, ku hê tu vê nizanîbî ezê ji te re bêjîm ci? Di edebiyata Osmaniyan de, teşbîhek wiha heye, dibê: "Filankes bakar gibi bakar." Malûm e, bi erekî beker ga ye, yanî dewar e. Dibê filanke- so bi tirkî dinêre, yanî wek ga dinêre.

Bi gumanâ min, wezîren me yên niha gellek ji wan jî bakar gibi bakiyorlar. Yanî wek dewaran dinêrin.



Stalin illibara xwe winda kîr yan Ataturk? Yek jî hêkelîn wî têne şikandin? Yê dîn? Weke ku di wêne de tê dînîn.

Seîdê Kurdi "Bedîlîzeman" (bê hemtayê demê, nadîde) di sala 1876 an de li gundê Nûrse, nehiya Sipayırtî, qeza Hizanê bajarê Bedîlîz hatiye dînyayê, navê bavê wî Mîrza (Mirzo), navê diya wî jî Nûriye (Nûrê) bûye. Heta ku dibe neh (9) salî li cem bavê xwe jîna xwe yê zarotî dîborîne. Li ba birayê xwe yê mezin Mele Ebdullah li gora adetê medreseyen Kurdistanê gramer (nehw û serif) a zimanê erebî sê salan dixwîne û ji ba wî diçe Sêrtê, di medresa Mele Fethullah de du mehan dixwîne, ji wê jî diçe Muksê medresa Mîrheşenê Wells, du mehan jî li wê dereli ba Mele Ebdulkârîm dixwîne, ji wê jî diçe Beyazidê, li ba Şex Muhammedê Celâli dixwîne. Tehsilâ wî yê xerîbiyê ji wê tarixê de dest pêdiye. Di medreseyen Kurdistanê de, piştî ku feqî grameye erebî xelas dîkin, 7-8 salen din jî dixwînin, paşî 'muntehî' dibin (xwendina xwe diqedînin, dibin mamoste, seyda). Lî belê Seîdê Kurdi, vê xwendina 7-8 salan di 2-3 mehan de diqedîne, seydayê wî Şex Muhammed lê şas dimîne, jê re dibêje: "Seîd, evqas kitêb, evqas ilm û zanyarî, di demek wiha kurt de naqede û mirov hîn nabe, te her kitêbek (pirtûkek) çend ders jê xwendin û derbasî yekî din bûyî, wiha nabe." Seîd dibêje: "Seydayê min, evqas kitêb û şerh û haşî, ci hewce ye ku mirov tevan bixwîne û xelas bike, divê mirov çend ders jê bixwîne, fêm bike û dest bavêje kitêbek din (di medreseyen Kurdistanê de, di her ilmî de kitêbên kifşe hene, mirov wan kitêban dixwîne û diqedîne) ci hewcye mirov tevan bixwîne." Şex Muhammed îtîraz dike, Mele Seîdê Kurdi fîmîshân dike, bala xwe didê ku Seîd her ilmî dizane, Şex Muhammed lê diheyîre û şas dibe. Seîdê Kurdi bi vî awayî xwendina medreseyan yên 15-20 salî, di demek kurt de diqedîne û bi mela û muderîsen (seydayê) wê demê re dikeve munaqeşe û têkoşînê, hemûyan mat dike û dibe "Bedîlîzeman".

Bi rastî jî, di zîrekî, zeka, fîkr, bîr, ilm û zanyariyê de, yek wekî Seîdê Kurdi, ji medreseyen Kurdistanê ranebûye. Di alema İslâmê de jî, mutefekkir, feylezof, zanyar û alimek wek wî tune.

Seîdê Kurdi dema ku li Bazîdê bûye, di her fersendî de çûye ser tirba (gora) Ehmedê Xanî, gellek caran bi sev jî di mescîda wî de maye, ji feyz û berekata wî payîdar bûye. Ev ziyaret û sekna di mescîda Ehmedê Xanî de, li ser jîna Seîdê Kurdi tesîrek pîr mezîn dike, Seîdê Kurdi dibe suxtêkî manewî (manewî talebe) ji Ehmedê Xanî re. Di nav xelkê de jî ev bawerî peyda dibe ku, Seîdê Kurdi dersa xwe yê heqîqî ji ruhê Xanî girtiye; bi rastî jî, Seîdê Kurdi pîr di binê tesîra fîkr û xebatê Ehmedê Xanî de maye, dersa Kurdi û xebata ji bo azadî û serfirâziya Kurd û Kurdistanê, ji ruh û canê wî hozanê mezîn û giranbuha, wî filozof û zanyarê Kurdan hîn bûye û wî jî, wek seydayê xwe yê manewî, dest bi cehd û xebata ji bo Kurd û Kurdistanê kiriye. Piştî ku ji Bazîdê vedigere, dikeve nav eşîr û qebîlê Kurdistan, diçe ba serok, sêx, beg û axayen wan, ji bo yekbûn û tifaqa wan dixebe, doza Kurdi û azadiya wan bi wan dide fêmkirin û li wan şîretan dike. Ji bo wan, bi zimanê wan "Reçeta Kurdan" dinivîsîne û dixwaze bi vî awayî derdê wan derman bike. Bi salan li ciya, zozan, gund û bajarê Kurdistan digere û dixebe, dixwaze ku universiteye wek "Camî ul Ezher'a Qahîreyê, li Wanê vebike û bi zimanê kurdi

Seîdê Kurdi

ABDURAHMAN DURRE



Bi rastî jî, di zîrekî, zeka, fîkr, bîr, ilm û zanyariyê de, yek wekî Seîdê Kurdi, ji medreseyen Kurdistanê ranebûye.

ders bide. Bi vê meqsedê diçe İstenbolê, daxwazname û raporek dide Ebdulhemîd. Di wê raporê de hemû kîmasî û iñtiyacîn Kurdistanê erz dike. Belê Sultan Ebdulhamîd sor û şovenîst, Mele Seîdê Kurdi davêje tîmarxanê (cihê dînan), dibêje ku dîn bûye. Piştî ku ji tîmarxanê derdixin, davêjin hepisxanê, dibêjin Seîd, Kurdan tehrîk dike doza serxwebûn û azadiya wan dike. Lî Seîdê Kurdi ji fîkra xwe naye xwar. Ebdulhemîd jê re dibêje: "Doza Kurdistanê û universîta

Wanê neke, tu wekî din ci bixwazî ezê bidim te, ezê te bikim Şêxulislam." Seîdê Kurdi qebûl naake û dibêje: "Ez Kurd im, bi mal û meqâmam dînyayê nayêm kîrîn û firotin." Bi Dr Abdullah Cewdet Beg, Bedirxanîzade Mîhat Beg, Kurdiîzade Ehmed Ramîz û Xelîl Keyali Efendi re li İstenbolê komeleya "Kurd Neşri Maarif Cemiyeti" ava dîkin, bi zimanê kurdi rojname û kovaran derdixin, li hemberî ideolojiya Turanî dertê. Seîdê Kurdi di dema 'cumhuriyetê' de jî vê

xebata ji bo Kurd û Kurdistanê didomîne. Seîdê Kurdi di Asarî Bediîye, rupela 332-3 an de wiha dibêje:

"Ey Asurilerin ve Keyanilerin cihangirlik zamanında peşîdar askerleri olan arslan Kürtler, beşyûz senedir yattınız, artık uyanınız sabahur... Rostem-i Zal ve Selahadin-i Eyyubi gibi Kürt dahi ve kahramanları ile beraber yaşamış fîkr-i milliyetiniz size emir ediyor ki birleşiniz, bir millet kadar büyük olunuz, ana dilinize sahip olunuz, diliniz sizî hamîyet-i

milliyenize şikayet ediyor, insan kaderi ana dilidir. Ana dille yazılan her eser, taşa yazılınaklar gibi ebedî kalır. Hamîyet-i milliyenizin bir örneği olan Halil Hayalî Efendi, dilinin alfâbesini ve gramerini yazmış, Kurdistan madeninden böyle bir cevher çıktıktan, daha onun gibi nice cevherler parlayacaktır..."

Seîdê Kurdi bi vê rewşa netewe-yî (millî) xebata xwe li İstenbol û li Kurdistanê didomîne, heta sala 1925 an, ku serhildana Şex Seîdê rehmetî dest pê dike. Seîdê Kurdi jî, herweki hemû zanyar û serokên Kurd, ku ji ber qirkirina kemalîstan xelas bûbûn, ji Kurdistanê dûr dîkin (sîrgûn dîkin), di sala 1926 an de davêjin Barlayê, qeza İspartayê, ji wê salc heta sala 1950 an nêzîkî 25 salan ji Kurdistanê dûr dimîne, bi hesret û şewata welat nav û dilê wî dipije û di heps û zîndanen zaliman de, di bin zîlm, zor û işkenciyen hov û haran de dimîne, belê bi tu awayî ji wan re serî danayne, li dijî kemalîzm û contırkân dertê, dinivîse û dibêje. Bi navê 'Risala Nûr' pîr kitêban derdixe, di pîrtûka wî ya bi navê "Beşinci Şua" de dibêje: "Kemalîzm Deccaleşî û bê imanîye, kemalîst jî Deccal in, şovenîst û sextekar in."

Heta ku di sala 1960 an de nexwes dikeve û bawer dike ku wê bimre, bi lez tê Riha (Urfa) yê (cihê İbrahim Pêxemberê kalê xwe), di 21'ê Adarê (roja Newrozê) 1960 an de wefat dike, li wir tê defin kîrin. Belê kemalîstên cuntaya 27'ê Gulanê (27 Mayıs), vî Kurdê zanyar û filozofî mezîn, piştî mirina wî jî, ji Kurdistanê dûr (sîrgûn) dîkin. Cenazê wî bi şev derdixin û dîbin cihekî ne kîf.

Seîdê Kurdi bi vî awayî di diroka Kurdistanê de cihê xwe digre û nemir dibe û dibe tîrs û xofa dilê şovenîst û faşîstan. Di kûrâyîya dil û canê hemû gelperweren Kurd û hemû misilmanen rast û durust de dijî, di his û bîra wan de ebediyen sax e, rehberî û seydatiya wan dike, nîşana qehremâni û merdîtiya Kurdi ye, her wekî hemû gelperwer, şoresser, serok, rehber, şehîd û xazîyen doza şeref û namûsî, azadî û rîzgariyê, ku ruh û canê wan şâ bin, rehmet û pîrozî li ser wan bin.

Divê ku mirov, jîna Seîdê Kurdi, bi çar merhelan diyar bike:

- 1- Seîdê kevin (1876-1926)
- 2- Seîdê nuh (1926-1950)
- 3- Seîdê sîyemîn (1950-1960)
- 4- Seîdê merhûm, dîsa jî nuh û taze (1960-1992 û ebedî)

Bi munasebeta dûrkirina Seîdê Kurdi, piştî mirina wî jî, divê ku em işaretî du xalan bikin:

1- Di qanûnê esasî (anayasa) cunta 27 Gulanê de gellek mafîn civakî, demokratî û insanî hene, lî belê bi tu awayî xwe ji ideolojiya kemalîzm xelas nekiriye, ji ber vî, di derbareyê Kurd û Kurdistanê de tiştekî nuh nehamîye. Gerçî di dema hazirkirina wî de, xwestin ku zimanê kurdi û tedrisata kurdi jî tê de bidin bi cih kirin (ez hazir im ku vî bidim ispat kîrin) lî belê İsmet paşayê kerr, bi his û mantıqa xwe yê kemalîst, nehiş û red kir. Dijîti û kindariya xwe ji bo Kurdan û mafîn wan, piştî rovîtiya Lozanî di vir de jî kîf kir. Niha kurê wî yê Erdal jî, li dû şopa wî ya bi qirêj diçe û serê xwe ji Demirel re dihejîne.

Di çavên kemalîst û tûraniyîn hov de ji Kurdi û doza Kurdiîyê girantir û mezintir tu guneh tuneye, lewra piştî mirina Seîdê Kurdi, cenazê wî jî, ji Kurdistanê dûr kîrin. Belê bi vî hovîtiya xwe, wî di dilê 30 milyon Kurd de ta ebed bi cih kirin.

Arkeolog û muzîsyenê Kurd Xalid Reşîd:

'Pirsgirêkên me di welatekî rizgarkiri de çareser dibin'

Xalid Reşîd ji Başûrê Kurdistanê ye, di sala 1961 an de li bajarê Silêmaniyê ji dayika xwe bûye. Dibistanê Seretayî li wir dixwîne û dûvre derbasî Ïtalya dibe. Berî ku derbasî Ïtalya bibe li bajarê Silêmanî 'grûba muzîsyenê ciwan' ava kîribû û li wir dest bi karê muzîkê kîribû.

Li Ïtalya dest bi dibistana muzîkê dike û li ser enstrumenten hilmî dixwîne, perwerde dibe. Piştî sê salan dibistanê tewaw (kuta) dike. Piştî li wir 'Grûba muzîkê a Kurdistan' ava dike û li gellek bajaran, di TV. de programen wî nîşan didin.

Xalid Reşîd piştî tê Swêdê û li vir jî dest bi dibistanê dike û diçe perwerdekirina muzîkê. Piştî saleki din ji vir jî bi şeweyekê serkevtî derdiikeve û paşî li unîversîta Stockholmêdest bi xwendina arkeolojî, dike. Piştî 4 salan ji vir jî bi serkevtî derdiikeve. Xalid Reşîd li gellek deveren

Ewrûpa konser dane û li ser arkeolojiyê jî pirtûkeke wî heye.

Muzîk ci ye, muzîka Kurdi çiqasî kevnar e?

-Muzîk ne hîs e û ne jî ol e, li ser hîsîn mirovan pirr tesîrê (hikarî) dike, bi qasî ol (dîn) an tê hezkîrin an jî mezin e.

Muzîka Kurdi pirr kevnar e. Di dema Zerduşt de (BM 660-583) li cihê olan li civatan muzîk hebû û bi kar anîna muzîkê jî xêr bû. Di wê demê de tembûr, bilûr û def hebûn û ew bi kar dihanîn.

Nîha di ci rewşê de ye?

-Muzîka me kevnar e, lê ji ber talankirin, qirkirin û dagîrkeriyan muzîka me hîna zaroktiya xwe dijî. Ji bo ku muzîka Kurdi bi pêşkeve, pêwistiya wê bi rewşa aştiyê heye.

Di dema aştiyê de mirov dikare, akademîyen muzîkê veke û lêkolînen fîreh bike û xwe li gorî çûna cîhanê tekûz bike.

Ji ber ku aşti tune, gellek kes henin ku ji muzîkê qet fam nakin (tê naghêjin) zû mezin dibin û piştî piştî xwe didin gel, ji rastiye û huner dûr dikevin. Ev tişt di welatê pêşdeçûyi de tunin. Li vir prove henin, hemû hunermend di vir re derbas dibin û dûvre, gav bi gav bilind dibin.

Bi tevayî û kurtî; muzîka me pêwistiya wê bi aştiyê heye. Aşti çawa tê bi destxistin, pêwist e mirov berê xwe bide vê pirsê û ev pirs jî, di welatekî de çareser dibe...

Li ser talankirina muzîka me dîstîna we ci ye?

-Bi taybetî li Bakurê Kurdistan gellek melodiyê Kurdi kirine tirkî. Ev diziyek hunerî ye. Rûreşiyek herî mezin e. Banga me heye ji tevayê muzîsyenê Tirk yê demokrat û yê Kurdistan, ku li hemberî vî tiştî rawestin. Muzîsyenê Kurd, pêwist e ji doh bêhtir xwedî li muzîka xwe derkevin.



Arkeolog û muzîsyenê Kurd Xalid Reşîd

Pêwist e muzîsyenê ku ez konserekê li Bakûrê Kurd herin cihê jêderâ Kurdistanê bidim û dûv re jî li Başûr.

Li ci deveran?

-Li Bakurê Kurdistanê min dixwest ku konsera xwe li Dêrsimê bidim û her wiha li Cizîra Botan. Bi riya rojnameya Welat ez silavê xwe dixwazim bighînim birayen xwe yê li Bakur û her wiha pêşmergên Kurd...

*Hevpeyîn:
Gabar Çiyan*

Folklorâ Botan (13) Stiranê evînî



Xwestina evîndaran e, peste ye û awaza wê oktavek (8 deng) û bêhtir e. Helbesta' wê gellek dewlemend e, ev stiran digel semayê (reqs) tête pêşkêşkirin. Morga (stîl) wê hêdî ye û ji aliyê nêr û mî ve tête stirandin. Naveroka wê jî ji nîvî wê diyar e ku bi gotinê hezkîrinê hatiye xemilandin.

Nimûne

1- Şîrîn û Ferhad, meqam Rast

Ferhad!
Dilê min tev birîn e
Nexweş im çare nînê
Of eman eman şîrîn can
Ferhadê te me ez qurban

Ka rêka havîna te
Ka derd û birîna te
Of eman eman şîrîn can
Hêvîya te me ez qurban
Te li min tarf kir jîn
Ji çava dibarit xwîn
Of eman eman şîrîn can
Nexweşê te me ez qurban
Hevîn: evîn

2- Ciranê, meqam kurdî Beyat

Cîranê halla halla
Ji bêhna te maşalla
Şeva me ronahî ye
Kêfî xweşî û şahî ye
Nîna, Nîna

Delalê halla halla
Ji bêhna te maşalla
Şeva me ci geş bûye
Dilê dosta xweş bûye
Nîna, Nîna

Şîrînê halla halla
Ji canê te maşalla
Şeva me ji bo welêt
Va bûye agir û pêt
Nîna, Nîna

3- Lo lo pismamo, meqam Ecem, Zaxoka Behdinan

Lo lo pismamo, dotmama te
me
Jaro pismamo, dotmama te
me

Bo xelkî b'next im, bo te
perwe me
Kirasmexmel im, memikxur
me me

Lo lo pismamo, kanya l'
çiyayî
Jaro pismamo, kanya l' çiyayî

Çi rî na çinê j', gul û giyayî
Her şev talan e, ser bextê
b'rayî

Lo lo pismamo, kanya l' nav
mala

Jaro pismamo, kanya l' nav
mala

Çi rî na çinê j', belgên helala
Her şev talan e, ser bextê
xala

Lo lo pismamo, kanya l' nav
gundi

Jaro pismamo, kanya l' nav
gundi

Çi rî na çinê j', belgên kulin-
di

Her şev talan e, ser bextê...
Perwe: belaş

Ev naverok digel stirandinê
bûne pênasî vî babetî (mewzûî)
ya ku ji aliyê kur û keçan ve tête
stirandin...

Li dûmahiyyê, li kêmahiyyê
nenêrin ji ber ku min kêm
nimûne ji xwendevanan re
berhev kirine... Wisa
nimûneyen baştir jî hene û
hêvidar im ku li pêşerojê dê
bêne belavkirin...

Beşîr Botanî

PÊNÛS

Amed Tigris



Ma em qasî bilbilê jî ji welatê xwe hez nakin?

Di van salên dawî de, mirov gelek caran rastê hinek nîvisan tê, ku dînîvisin: "Hezar sal in, ku gelên Tirk û Kurd bi hevdu re dijin. An jî "qedera van herdu gelan yek e." Qedera wan bi hevdu re girêdayî ye" û hwd.

Ev dîtinênil wilo hem ji aliye kese û hêzên Tirkan ve û hem ji carna ji aliye hinek Kurdan ve jî, tê zimê. Karbidest û birêvebirêne ideoolojiya dewleta Tirk, heta niha di her fersendî de digotin "Kurd tune ne." Lî, niha mecbûr mane "realîteya Kurd" qebûl dikin, lê belê dîsa mafê Kurdan ên neteweyî û demokratik tune ne. Ji bo Kurdan, bi tenê mafek heye. Ew jî kuştina Kurdan e. Ji ber vê yekê jî her roj serokkomar, serokwezir, wezir, general û kesen din yên karbidest û birêvebir di axaftin û daxwîyaniyêne xwe de dibêjin:

"Belê li Tirkîyê Kurd hene. Ew, di derece û rîza yekemin de hemwelatiyêne me ne. Hezar sal in, ku em bi hevdu re, li ser axa welateki dijin. Ji aliye ol (dîn), al, ax û danûstandinê ve em bûne yek perçe, yek netewe..."

Ji aliye din ve, kêm be jî carna mirov rastê hinek axaftin an jî nîvisen Kurdan jî tê, ku hema hema di vê paralel û çarçoveya jorîn de ne. Yanî ew jî dibêjin: "Em nêzî hezar salan in, ku bi hevdu re dijin. Me keç dane hevdu. Pez û mirîşkîn me ketine nav hevdu. Bi hezaran Kurd hatine hêla metropolê, derya (behr) û avtenga (boğaza) me tune. Balefirgehêne me tunin, her çar aliye me dijmin in. Ji bo van sedeman jî, ji me re sexwebûn navê" û hwd.

Baş e, em li ser dîtin an jî minakêne dagîrkeran nesekinin, ji ber ku armâanca wan diyar e. Lî, ew Kurden me yê ku wiha dibêjin an jî diffikirin re cend gotinê min hene, ku ji wan re bibêjim. Wek hûn dibêjin "hezar sal in, em bi hevdu re ne jiyan e." Na, ne wîlo ye! Bi rastî ev nêzî hezar sal in, ku welatê me dagîr kirine. Dagîrkeran dest dane ser ax, mal, mulk, ziman, edebiyat, kultur, şeref û namûsa me. Yanî hezar sal in, ku welat hatiye talan û işxal kirin û neteweyâ me jî, ji xwe re kirine xulam û kole. Devê mirov çawa digere an destê mirov çawa dikare pêñûse bigire û binivîsine: "Hezar sal in, ku em bi hevdu re dijin. Qedera me yek e..." Heger hinek bêjin, "na lo, em bi van gotinan takîkan dikin." Ev takîken wîlo, êdî gelek kevin bûne û di jiyanê de jî qet naborin! Kî ji kî re takîkan dike! Ma hûn dê bi takîken xwe dagîrkeren hezar salan bixapînin lo? Em bîn ser pirsa derya û avtenga. Ez geliyê Elî Begê, gola Wurmiyê û ya Wanê li aliye kî bîhîlim, Kaşê Reş ê Licê, bi hezar avtenga iştenbolê û berava deryaya Spî û ya reş nadîm. Ma qasê bilbilê jî, em ji welatê xwe hez nakin. Bilbil tûma striyan nade bi qefesa zêrin.

Pirtûka dersê: Ji bo cografayayê

Wek ku di navê vê pirtûkê de jî diyar e, di warê cografayayê de pirtûka dersê ye. **Kurterastî**, li Swêdê, di dibistanan de, ji bo zarokên Kurd tê bi kar anîn. Pirtûk ji aliye mamoste Amed Tigris û B. Welatevin ve hatiye nîvisandin. Wênciyen wê **Kemal Culegergi** çekiriye. Beri ku pirtûk çap bibe, komek mamosiyênen zimanê kurdi, pirtûkê di çav de derbas kirine. Pirtûk ji aliye enstituya dewletê ya metaryalêne Swêdê ve hatiye çap kirin. Çapa yekemin di Adara 1991 an de, bi tîpen latînî û zaravayê kurmancî, ji

aliye weşanxana APEC ve hatiye weşandîn. Niha eyîn weşanxane çapa duyemîn bi tîpen erebî û zaravayê Soranî çap dike.

Di pirtûkê de ev mijar hatiye hilbijartîn: Alînasîn, pisûle, krokî, plan û nexse, rûerd, aşîman, dinya, gerêne dînyayê, erdej, çar demsal, roj û şev, demen rojê, hîv, girêdana hîv û rojê, salname, saet, hewa û şili, keskesor, ax, av, ba, rastçewt û ferhengoka bi kurdi, swêdî û tirkî...

Pirtûk bi fotograf û nexş (xerîte) e. Di dawiya her mijarî de beşa spartîne (ödev) heye.

Kurterastî bi metodê

Plûralîzma Umer Şêxmus'î û ziwanê kurdkî

J. Espar

Ez zana namey Umer Şêxmusî şima wendoxanê Welatê rî xerîb yeno. Şima raştey cê persî ez né camêrdî rind néşinasnena. Labelê ez zana Kurd o, Swêdê di roşeno û heze objektiv "roşanbîr" hesebêno.


Nê rojî kovara Federasyonê Kurdanê Swêdê di yew nuştay Umer Şêxmus'î vejiyaya. Ez vana qey aşmî- diaşmî ra ver zî, mi qisekerdişê né camêrdî yew radyoyey Kurdan di goştaribi. Mi sewbî zî yew- di nuştey cê wendbî. Û ay nuştandê cê di zî gelek çidê şâşî bî. Labelê tiya di ez nîwazena mesela zaf vila biko. Ez do tenya qisekerdişê radyo û nuşta yêye peyeni ser o vindero. Qisekerdişê xwinê radyo di Umer Şêxmus derheqê PKK û lejê Kurdistanê Vakurî di wina vano:

-Hukmatê Demireli wayştinî Tirkîya di demokrasî over (aver, raver) bero. Labelê PKK bi aksiyonandê wxinê eskerî verniya demokrasiya Tirkîya girewi û nêverda demokrasi bero Tirkîya.

Umer Şêxmus yew cadê roportajê di zî wina vano:

-Biyayîşê PKK ne tenya Kurdanê Vakurê rî, labelê, heme perçandê Kurdistanê rî yew katastrof o. (felaket o)

Mi çaxo ki nê rezê corêni radyo di goştarî ez şâş biyo. Mi va gelo radyoyey Kurdan qisanê anasaranen senêhewa vila kena? Mi qisekerdo zaf meraq kerd. Semedo ki mi radyo vernî ra nêgoştaritibî mi nêzanayî kam qisey keno. Mi pîzdede xwi di va no kami ki esto, yew merdimê dewleta Tirkan o. Ya zî beno ki radyo bi xwi qisanê yew wezîre Tirkan dana. Tira pey ez tayn embazan persawo yîni va ki no Umer Şêxmus o. Yanî yew Kurd o. Ay wext ez hina vêşî dejawo.



pedagojîk hatiye amadekirin. Kurdiya wê sivik e. Hevok (cumle) kurt in. Ji aliye termen cografiye ve çavkaniyeke baş e. Tip gir in. Çap spehî ye. Berg rengin e. Kurterastî 48 rûpel e.

Çunki ma Kurde Vakurî nê qisanê Umer Şêxmusî hergû roj radyo û televizyonde Dewleta Tirkan ra goştarenî. Dewlet vana: "PKK nêverdena ma demokrasî biyari Tirkîya, PKK terorist a û seredê Kurdan rî bîya bela." Pekî Dewlet vana: "PKK nêverdena ma demokrasî biyari Tirkîya, PKK terorist a û seredê Kurdan rî bîya bela." Pekî Dewlet vana: "PKK nêverdena ma demokrasî biyari Tirkîya, PKK terorist a û seredê Kurdan rî bîya bela." Pekî Dewlet vana: "PKK nêverdena ma demokrasî biyari Tirkîya, PKK terorist a û seredê Kurdan rî bîya bela."

Nuştay Umer Şêxmus'î bi Kurmançî ya û ziwanê Kurdkî ser o ya. Ez do nika na nuşta Umer Şêxmus'î ra yew parce şima rî tercume biko:

"Ez bi xwi yew mîrdimo zaf demokrat o û gelek bawerey mi plûralizmê yena. Xebatê ilmîye ki newe ziwan û kulturi ser o bî, nawnenî ki, biyayîş zaravanê (diyalekt, lehce) ciyayan kulturê milletan pêt (zengin) kenî. Cora ez na persi ser o yew modelo plûralist pêşkêş keno: No zî no yo:

1. Heme Kurdistanê di Sorankî û Kurmançî bero wendîs.

a. Mintiqandê Kurmançan di

Kurmançî zarava yewin û Sorankî zî ey diyin bo.

b. Mintiqandê Soranan di Sorankî zarava yewin û Kurmançî zî ey diyin bo.

c. Mintiqandê Zazayan di Kurmançî zarava yewin, Zazakî zarava diyin û Sorankî zî zarava hîrin bo.

d. Mintiqandê Hewremnan di

Sorankî zarava yewin, Hewremankî zarava diyin û Kurmançî zî zarava hîrin bo. "(B'ewnê; Berbang Homar 81, riperr: 26)

Ma heti yew qisa esta vanî: "De bê nê herî nê çomir ra veji!" Na ci demokratey û ci plûralizmey a?! Umer Şêxmus'î bi "demokrateyda xwi, yew ray di Zazakî û Hewremnanî werte re hewena. Aw semed ra no "modelê" Umer Şêxmus'î yew modelo plûralist niyo. No fikir yew fikirdo lokalîst û feodal o. Yew mîrdimo modern û zanaye behsa "modelanê" anasaranen nêkeno. Beno ki Umer Şêxmus'î me'nay plûralizm zano, labelê ez bawer nêkeno ki Umer Şêxmus'î demokrat o û bawerî plûralizm ano. Vano Zazay û Hewremnanî mecbûrî Kurmançî û Sorankî banderbî. Labelê ne Kurmançî û ne zî Soranî cab nêkeno Zazakî ya zî Hewremankî banderbî. A diyin Zazay û Hewremnanî mintiqandê xwi di zî ganî verî Kurmançî û Sorankî bander bî. Pekî Umer Efendî çirî ganî Zazay û Hewremnanî, Kurmançî û Sorankî banderbî û çirî Soranî û Kurmançî Zazakî û Hewremnanî bander nêbi? Tiya di kriterê to ci yi? No heq kamî dawo to ti Stokholm di roşî û vaji "şima filan ci qise bikî û şima qise

mekê." Ti qalê ilm kenî. Kam ilmdê çiyo anasaran esto? Ti qalê demokratey û plûralistey kenî. Ci têkili nê fikrandê to û demokrasî û plûralizm tê reyra esto? Eke kes bi qisan bibim demokrat û plûralist Dîna di mîrdimo nêbave û diktator nêmendinî. Persa demokratey persa bawerey a. Mîrdimo demokrat verê heme ci yew mîrdimo objektîv o. Baweriya cê bi ilm û raştey esta. Bewerey jey bi heq û hîqu esto. Wayire yew moralde (ehlaq) pankî yo. Hema kes vajo ez demokrat o, nêbeno demokrat. Umer Şêxmus, bi name bê ci beno yo zano, kes nîşno vajo no zaravay Kurdkî wa bêro qisekerdiş û nuştiş ay bî wa vînî bo! No fikir, neyare (duşmenê) yewyeda ziwandê ma wo.

Yew modela anasaran nîşno persa ziwanê Kurdkî hal biko! No model zaf modeldê kolonyalistan ra durî nîyo. Kolonyalistan hetanî nika vatîni ziwanê şima çini yo. Umer Şêxmus zî çend milyon Kurdan ra vano şima bi zarava xwi menuê mewanê û bander mebê. Zaravay şima zaf muhîm nîyo, şima qise nêkê zî beno.

Dardê serê dardan Umer Şêxmus chendey neheqey ra pey şêno behsê "şofenizma" (wa wendox na vata şovenizm biwano) zaravan biko. B'ewnê Umer Şêxmus "şofenizma" zaravan ser o se vano:

"Tersey mina gird ayaya ki şovenizma zaravanê Kurdkî (herkes semedê zaravadê xwi) ehendeyî xurt ba ki Dewleta Kurdistan çidê inhewa sembolik ser o xirab biba..." (Berbang, homar 81, riperr: 26)

Verê ganî ez vaja, ez bawer nêkeno heqê Umer Şêxmus esto "şovenizma" ra lomey biko. Çunki bi no modeldê xwi şovenisto en gird Umer Şêxmus o. Umer Şêxmus Zazakî û Hewremankî erzeno yew kiş û ma ra vano şima Kurmançî banderbê. Pekî eke şovenizma ki Umer Şêxmus ti ra terseno na niya, gelo ci ya? A diyin wa Umer Şêxmus bizano ki persa zaravan yew persa sembolik niya. Na pers ser o ne Umer Şêxmus, labelê roşanbî û akademisyenê Kurdan ganî yew hewawo ciddî bixebeti. Xwira meselandê sembolikan ser o dewlet- mewletî zî nêricenî. A hîrin, herçî wa Umer Şêxmus bindi xwi nêdejno Kurdistan inay ser o xirab nêbena. Labelê, eke serekê Kurdan goş bîdî mîrdimandê zey Umer Şêxmus do no problem hina gird bibo.

Ma heme zanî persa ziwanî problemândê cemâtê ma Kurdan ra yew a. Do cemâtê Kurdan zey gelek persan na pers rî zî yew çare veyno. Çarewo ki cemât bi xwi veyno ez bawera do ey Umer Şêxmus ra zaf demokratê bo.



CİZİR BOTAN: Ehmedê Xanî, xwendîna xwe ya dînî li vir temam kir.

Li ser şopa Ehmedê Xanî (5)

Felat Dilges

E. Xanî di dema herfî nebaş de li zimanê kurdfî xwedî derket, li ser rezimana kurdfî xebitî û ferheng amade kir. Bê guman beriya E. Xanî jî yên ku bi zimanê kurdfî dinivîsîn û berhemên xwe bi zimanê kurdfî dabûn hebûn; hê di sedsala yazdan (11) de Elî Herîrî bi zimanê kurdfî dinivîsî (21). Di pey Elî Herîrî de helbestvanê wekî Feqiyê Teyran, Mele Ehmedê Batê û M. Ehmedê Cizîri (Seydayê Cizîri) li paş xwe berhemên gelek giranbuha ji neteweya Kurd re hiştin. Di gel ev helbestvan cihekî gelek girîng di dîroka edebiyata kurdfî de digrin jî, dîsa em nikarin van nîvîskaren Kurd bi E. Xanî re rûberû bikin. Di warê edebiyata tasawûfî de di navbera van helbestvanan û E. Xanî de dirfîvdanek hebe jî, di mijara netewetiye de E. Xanî di merheleyekî gelek pêş de ye. Ev qonax qonaxekî pîr bilind e û E. Xanî di vê merhelê de ji bo neteweya Kurd dinivîse û ew berjewendiyen Kurd û Kurdistanê dirame. Bêguman di afirandinê helbestvanê beriya E. Xanî de ji naverokekî civakî heye; nemaze ev rewş di berhemên Feqiyê Teyran de bêtir bi eşkereyî xwiya dike. Helbesta kurdfî bi Cizîri re ges dibe û bi E. Xanî re dikeve xizmeta ideolojiya neteweyî (22). Bi awayekî sergîrtî be jî hin reng û motîvînetewetiye di helbesta Cizîri de xwiya dikan? Em dikarin bêjin ku rola helbesta Cizîri li ser helbesta neteweyî ya E. Xanî heye. (di pêş de ez dê bi awayekî berfirehî li ser vê pîrsê rawestim.)

E. Xanî ramanwêrekî dûrbîn û xweser e. Armanca wî kîfî e. Xisûsiyetekî E. Xanî ya girîng jî ev e: Ew dizane ji bo ci li pey ci ye. Helbestvanê nemir baş bi hêza helbestê û rola wê ya li ser civatê dizane. Mirov dikare bêje ku E. Xanî ji bo ku mesaja xwe ya siyasi ragihîne civatê, di dema xwe de ji helbestê bikertir wasitayekî din nikaribû peyde bikira.

E. Xanî ramanwêrekî dûrbîn û xweser e. Armanca wî kîfî e. Xisûsiyetekî E. Xanî ya girîng jî ev e: Ew dizane ji bo ci li pey ci ye. Helbestvanê nemir baş bi hêza helbestê û rola wê ya li ser civatê dizane. Mirov dikare bêje ku E. Xanî ji bo ku mesaja xwe ya siyasi ragihîne civatê, di dema xwe de ji helbestê bikertir wasitayekî din nikaribû peyde bikira.

dengê wî olan da û her ku çû bilindir bû, li seranserê Kurdistanê belav bû. Heke fro li Kurdistanê yên ku di medresan de xwendine, ji ber bi malikên E. Xanî dizanibin ev girîngiya helbestê radixe ber çavan. Bi kurteberî helbest deng û mesaja filozofî nemir a ji bo neteweya Kurd bû.

E. XANÎ Û EHLAQÊ ZANISTÎ

Di cihanê de kêm alim bi qasî E. Xanî nefsbîcûkî bûne. Li ba wî qureti tunebûye û wî tucar xwe mezin û zana nîşan nedaye. Ji ber ku ew mirovîkî dûrbîn bûye û ji metoda xebatîn ilmî û pêşveçûna zanyarî agahdar bûye, tu xebat û berhemekî xwe bê kêmâsi nedîtiye û nehesibandîye. Di hemû kîrinê xwe de para çewti û xeletiyan hiştîye û herdem bi vê hestê tevger kiriye. Prensiba "tu xebatîkî zanyarî tekûz û bê kêmâsi nîne" tucar ji bîra wî derneketiye. Tirsekî wî ya mezin jî ev bûye: Yêñ ku di pey wî de bîn, çewtiyîn wî derxin hole û bi wan tinazan bikin. E. Xanî ji mirovîn wiha pîr direve û li ba wî ev mirov ne qencîxwaz û arnamekî wan a zanistî tune; lê belê kîndar in. Mirovîn wiha berjewendiyen civatê naramin û hergav li pey tiştîn erzan û sivik in. Armancîkî wan a bisixbîr (tutarlı) û bikertî jî tune.

E. Xanî bi hêvî û bi minet ji mirovîn zana qal dike û ji wan bawer e da ku ew û çewti û kêmâsiyîn wî temam bikin û bi wî tinazan nekin. E. Xanî ewqas ji quretiye dûr û wisa nefsbîcûkî e ku dibêje: "Ez Kurdeki çiyayî me û perwerde nebûfî me; xwe bi xwe gîhiştî me; bila xwedîyê xerezê

(kînê) jî li min guhdañ bikin û kêmâsiyîn min binixêmin. Ku bi wan dibe yê çetir bêjin, li kêmâsi û çewtiyan ecêb nebînîn." E. Xanî di besê "Meyger! Mey. Têke Qedehe" de wiha dinivise:

Umid ew e ji ehle frfan
Ew dê negirin li min çu herfan
Teşnî nekin, wekî xeyûran
İslah bikin li min qusuran
Eshabê kemalê perdepoş in
Erbabê xerez di pîr xuroş in
Memûl ew ji ehle razan
Ew de nekirin bi min tinazan
Ez pîlewer im, ne gewherî me
Xudreste me ez, ne perwerî me
Kurmanc û kohiy û kenarî
Van çend xeberêd girdevarî
İmza bikin bi hisnî elfat
İsxa bikin ew bi semî insaf
Eshabê xerez ku guh bi dîr in
Eyban bikirin, li min vesérin
Ava rûyê şâfrî nerêjin
Ger mumkun e, yekî qenc
bîbejin

Sehw û xeletan nekin tecib
Tawîl bikin ji bo teesib (23).

Bi rastî ev ehlaqê zanistî bi kêm kesan re bi vî awayî hebûye û di vî warf de E. Xanî nimûneyekî balkê e. Di xebatîn ilmî de ehlaqê zanistî pîr girîng e. Mirov çiqas şareza û çiqas alim dibe bila bibe, gava ku mirov ve zanabûna xwe çareseriya paşin bibûne û gotina xwe gotina dawîn nîşan bide, wê gavê mirov ehlaqê ilmî pêpas kîfî tê hesibîn û hê ji serif de riya mekanîzma rexne û xwerexnekirinê (eleştiye ve özelestirî) digire. Di xebatîn zanistî de mekanîzma rexne û xwerexnekirinê pêwistiyek zarûrî ye. Li cihen ku ev mekanîzma jiyan nebîne di xebatîn zanistî de xitimandinê girîng peyde dîbin. Riya emîlandîna mekanîzma rexne û xwerexnekirinê jî di xebatîn edebî û



Şêrê azadî

R ojekî li nav dehlekî (daristanekî) mezin, şerek rastî mişkekî tê, mişk ku şer dibîne, qidûmî wî dişkê, dibe çivte çivta wî, di cihê xwe de mat dibe û disekine. Şer ber pê diçê, mişk dilerize, lava li şer dike, dibêje: "Padışahê min, qiralê daristanê, ez ji te daxwaz û niyaz dikim ku tu min bibexşîni, ez ber diranê te ji nagrim, tu bi min têr nabî, min efû bike, dibe ku ez rojek bi kîfî te bêm." Şer dikene, dibêje: "tu mişkekî beredayî yi, ez şer im, tû yê bi ci awayî bi kîfî min werî?" Mişk dibêje: "Qiralê min tu min azad bike û sebir bike, te di, gavek hat ku ez bi kîfî te hatim." Şer dîsa dikene, dibêje: "Jixwe ez têkîl te nabim, tu nêçîra min nîni, ji min re fedîye ku ez te bixwim, ez şer im, ne gur û çeqel û rovî me, here min te azad kir." Mişk pir spas dike û diçê. Şer difikire û xwe bi xwe dibêje: "Mişk belengaz wê ci bi kîfî min were, rebeno ji tîrsa ziravê wî qetiya, nizanibû çawa bike, wilo got."

Gav û dem bi ser de derbas dîbin. Şer rojekî dikeve dafikê, lingê wî bi bendekî stûr girêdidin, ku postê wî jê bikin. Mişk di wê derê re derbas dibe û şer dibîne, diçê cem şer, dibêje: "Qiralê min, te ez naskirim? Ez ew mişk ku te ez azad kirim, eze ji iro bi kîfî te werim, qencîya te ji ser xwe rakim." Şer dîsa ji dikene. Mişk dev dixe werîsê ku pê şer girêdane û dikoje, heta êvarê pê dadikeve, ber bi êvarê ve werîs diquirfe û lingê şer jê xelas dibe, şer ji dafikê difilitê û azad dibe, dibêje: "Mişko, te qencîyek pîr mezin bi min re kir û hem ji te ev rastî bi min da zanîn ku dawiya qencîyê her tim qencîti ye, divê ku mirov qencî bike û tu kesi ji biçuk nebîne, roj heyen ku mişk ji şer ji bi kîfî e." Mişk dibê: "Paşayê min, wilo ye, lê ku mirov bê esl û bê şir nebe, kesê bê esl û bê şir qencîyê nizanîn, tu qencîyê bi wan bikî dibe xerabi, mesela di cihê te de ku gurek, çeqelek, an ji roviyek bûya min werîsê wan venedikir, lewra ew bê şir û bê pîr in, ku ji dafikê derketana wê qencîya min ji bir bikirana û wê min bixwarana." Şer bi vê gotinê ji pîr dilxweş dibe û ji mişk re pîr spas dike, diçê.

Bi munasebata vê çirokê, em dixwazin ku ji xwendevanê eziz re vê rastîyî kîfî bikin ku miletê Kurd ji wek vê çirokê, bi herkesi re qencî kirine û dîkin, belê dîjiminê wan gur, çeqel û rovî ne, bê şir û bê pîr in, ji qencîyê fêm nakin, wekî mişka ji nabin, şer çawa ku ji mişko ders hilda, divê ku gelê Kurd ji, ji bûyeran ders û ibret hilgirin, şiyar bin, zana bin, édi nekevin dafik û bendenê nêçîvanê qesmer, teres û geleş.

Bi heybet şerekî rabû, ji alî rojhîlatê da
Ji dora Ormiye û Wanê, çiyayê Araratê da

Li zozanê welat, pêda geri serbest û aza bû
Ji Zap û Dicle hat, lê da çû Munzûrê ji Çatê da

Xwe berda dev-devê Mûradê, Çû Şengal û Hemînî
Ji Botan çû Mehabadê, ji Xabûr û Firatê da

Gerî ku'l war û zozanê welatê Serhedê pê da
Birîndar bû ji Lozanê, ku ma'j lept û lepatê da

Ji govenda serefrazi ku ma ew şerî azadi
Li textê Çarçir-a Qazî, di qeyd û bend û matê da.

Ilekîlinen zanyarî de hergav para çewtiyan hiştin e. E. Xanî bi vê xisûsiyeta xwe jî di ser demê de ye. Bê guman di pêşveçûna ramana Ewrûpa de rola emîlandîna mekanîzma rexne û xwerexnekirinê ji pîr girîng e. Edgar Morin, vê pêşveçûnê di her deme de bi hebûna ramânîn dijber ve girêdide. Li gora dîtina E. Morin, Karl Marx rexnegirê herî mezin û dinya hemdem e (24).

Nefsbîcûkî û ji pêşveçûna zanîn re hurmet nîşandayina E. Xanî di van rîzîn jérîn de jî bi eşkereyî xwiya dike:

Xanî ji kemala bê kemalî
Meydانا kemalî dîtî xâli
Yanî ne ji qabil û xebir î
Belkî bi teessib û eşîr î (25).

E. Xanî bi van rîzîn jî beyan dike ku meydana kemalî, qada ilmî vala bû; ehlîn vî karî ne li holî bûn û ne li ser xebata xwe bûn. Heke min (E. Xanî) dest avetîbe vî karî sedem xalîbûna qada kemalî ye. Ez ne mirovîkî xwedî qabiliyet û zana me. Sedemî dest avetîna min a vî karî

Çavkanî:

21- Bazıl Nîkîn, bhd, r:181

22- Rojen Barnas, Hêvî-hejmar:6, Şairê Ronahî û Hisyariyê Cegerxwîn, r:7

23- E. Xanî, Mem û Zîn, r: 76

24- Edgar Morin, Avrupayı düşünmek, çev:Şirin Tekeli, Afa yay. r:122

25- E. Xanî, Mem û Zîn, r:60

Gulbihar:

Ka ew hingivînê cara
Di nav wan teht û dara

Were mêsê derwêşê
Zîrekê zehmetkêşê

Lêva min a lîlozî
Bo te cejnepîrozî

Li şûna gul û gulzara
Min bimije wek yara

Evînî xweş evînî
Xwînê bike hingivînî

Ji vê xwîna pîrr paqij
Tîjî awaz û lavij

Awazên jîna rastî
Hemî evîn û aştî

Bike hingiv bo mala
Bo cotyar û bo pala

Bo şahîn û rewşenê
Bo Yonan û Gulşenê

Bo her kesê zikbirsî
Ji bê kesî cîrmisî

Ji nêza ger ji derda
Li hemî war û erda

Were mêsê gulmijê

Gulbihar û mêşa hingivînê



Pîroz e warê tu jê

Buhuştâ bîr û çav e
Gul û bilbil di nav e

Mêş:

Ev ci pesn û dûrok in
Çi gotin û çîrok in

Qet hew na bin gote
got

Gulê te cerg li min sot

Çîrok û çîrvanoka
Vexwîne bo zaroka

Ev e bo te sed girov
Hemû nişan û dirov

Hirça şane ne hêlan
Ez ê li çol û bêlan

Hingivînê min keriftin

Şîlx û şane heriftin

Hirçê pîsê devgenî
Min digotê ezbenî

Tîtvîa mês û gula
Ji hemû rex û mila

Hingiv rija ser xwînê
Rebî kafir nê bînê

Dîsanê me destpê kir

Hingivê şêrîn me çêkir

Mêşen me wê d'livlivin
Bi dilgermî d'tivtivin

Dimijin şîrova gula
Li ber awazên bilbila

Hema ku me kir tîtvî
Bixwin her bixwin
hingiv

Kar dikim bo mirova
Guh nadim hirç û hova

Gotina te ji dil e
Lêva te ya bilbil e

Lêva te ez na mijim
Bilbilê te na kujim

Her gûlê delalê
Were vê serê salê

Gel hogir û hevalan
Diyarî bixwin ne bi
talân

Xelat e xweş xelat e
Xêr û xweşîya welat e

Boy zarokêna sava
Bo xwarina bûk û zava

Di gel maç û silava
Xwedê mala te ava

Civîk

Civîkeke rind û ciwan di nav baxekî pîrr bi av û mêwe de dijiya. Carek ji caran wisa biryar da ku vê navçê bihêle û berê xwe bide geşteke dûr. Paşî çû cem hevalên xwe û ev tişt ji wan re got, lê, ew tev razî nebûn. Civîk jî serhişkane biryara xwe dabû û kete rê, berê xwe da herêmên dûr û ne diyar!

Civîkên din jî bi koçkirina hevalên xwe gellek dilgiran û xemgîn bûn, wisa bawer dikirin ku careka din hevalê xwe nabînin. Lê piştî wextekî dûr û dirêj civîka rind û xweşik vegeeria, hevalên wê çûn serdana wê û pê hesiyan û dîtin ku civîk bedewiya xwe li xerîbiyê daniye û dengê wê yê zelal pîrr nexweş bûye.

Civîka serlêşêwayî êdî li nav bax aram girt, lê cûka cûka wê nema. Bi vî awayî hevalên wê vê rastiyê fam kirin: Her kesek ku nîstiman û welatê xwe bihêle şeng û deng û rengê xwe jî winda dike!

*Ev çîrok ji pirtûka "Koç bo daristan" hatiye wergirtin.

Mehabad Kurdi

Konferansa Enstîtuya Kurdi

Destpêk rüpel 1

Prof. Celîl Celîl, li ser rewşa enstîtuyê û kar û barêñ wê rawestiya. Ji bo enstîtu karibe rola xwe yê girîng bileyize, pêwistiya hinek metodan pêşneyar kir û konferansa xwe wiha domand: "Enstîtu kar û barek gellek gîran hilgirtiye ser milêñ xwe, ji bo van karêñ xwe karibe bi serfirazî pêş ve bibe, xebatek profesyonel lazim e. Di bin siya enstîtuyê de, avakarêna saziyîn cihê cihê û berhevkirina berheman pêwist e. Ji bo van berheman, bi metodek zanistî bêñ berhevkirin, arşîvkirin û bikaranin jî, divê banka hebin. Wek banka ziman, bank'a zanîn... û hwd. Weki din, ji bo enstîtuyê gerek e kadro bêñ amadekirin, ku enstîtu di berhevkirina

berhem û destnivîsan de û di xebatêñ xwe yê zanistî (ilmî) de nekeve tengasyî."

Celîl Celîl, avakarên enstîtuyê û besdarîn konferansê, li ser problemen aborî jî rawestiyan û ji bo çareserkirina vê pîrsa girîng jî pêşneyarêñ xwe ji hev re gotin.

Di dawîya konferansê de Celîl Celîl bangâ xwe ya ji bo destnivîsan kevin ku di destê Mele, alîm û rewsenbirêñ Kurd de vesartine nuh kir û wiha got: "Hêviya me ew e ku, xelkê me, rewsenbirêñ me melayên me van destnivîsan kevin ji bo bibin malê çand û edebiyata Kurdi, bibin malê civaka Kurd, bisînîn ji enstîtuyê re, da ku bi xebateke zanyarî bêñ niqandin û weşandin."

daxwaza Hayri Kozakçioğlu, super waliyê demekê ku niha waliyê İstenbolê ye tîne cih.

Baş tê bîra me, berî bi çend mehan, di civîna ku generalen Türk û waliyê gellek bajaran besar bûbûn de, waliyê İstenbolê Kozakçioğlu wiha gottibû: "Bila demeke kurt çapamenî dengê xwe demexe û çavê xwe bigire, emî de ses mehan de pîrsa Kurdi ji kok ve bi temamî hal û safi bikin. Ev gotin dihatin vê maneyê: Emê bi hezaran kesen pêşverû û welatparêz ji gelê Kurd bikujin, çapamenî ji bila behsa qetfîman neke, tenê bila xelkê bi tiştîn û mesgûl bike.

Wisa xwiya dike ku BBC ji wek rojnamayen Tirkîyê vê daxwaza Tirkîyê yê xwînxwar tîne cih û ji qırkırinîn kontr-gerfî, ji işkenceyan û ji hemû kîrînem gemari yên artêsa Türk çavê xwe digire û rola xwe ya berdevkiya faşizmî bas dileyîze.

BBC bi vê helwest û tewra xwe

ROJEVA WELÊT

Hizbûldewlet, hizbûlsezgîn û ...

Destpêk rüpel 1

Serherda li ser rîya Botanek nuh e. Botanêñ me zêde-dibin û giş kevir û kuçen bajar û gundêñ me li neyar dibin reşkê şevê, gerîla û serîhîdan.

Xew li militaris, fasîst û nijadperestan herimiye, xewnen gerîla û PKK dibînîn, ji nav cih û livînîn xwe çem dibin. Ne şev li wan şev e û ne jî roj li wan roj e.

Eskerîn ordiyê ji şer direvin, firar dikin. Firarkirin û reva ji eskerîyê çendqat bûye. Her roj û her poste çend sed kesen din li hejmara firaran zêde dibe. "Hejmara firaran 230 hezar e." Ev gotina Wezîrê Bergirîyê Nevzat Ayaz e.

Di destê dewletê de mane tîmîn taybetî, mirovîn bi kîr girtî, serserî û lumpenîn li rastan û ceşî û cerdevan. Ev in hêz û qeweta dewletê û ardû paleynîn mekîna şerî taybetî li Kurdistanê.

Tîmîn taybetî, bînaşî û bermayîyen MHP, UGD, MTTB, Akıncılar, ETKO, TİT û giş şebekîn cinayet û kuştinê xwe li hember şerî gel, yekîñî û tîfaqa Kurdan nagrin, bê çare û bê gav bûne. Tîm û esker û elemanen ordiyê bi gerîla re nayen miqayesekirin, bînerin bê Wezîrê Hundî berî bi demekî şî gotiye: "Çiyayîn esker û tîmîn min xwe saetekî dighînin şerî wê gerîlayen PKK di 7-8 deqîqan de pê ve hildipirîkin."

Di nav vê psikoloji û rûhiyeta şikestin û windakîrinê de dewlet zewrîn terorî, kuştin û girtînî disidîne. Rojnamevanen Gundemî, Yeni Ülke û yên kovarîn din teror dike, mirovîn rewsenbir, welatparêz û xwenda ji malen wan dibe û nebedî dike. Èrisan dibe ser buro û daireyîn Partiya Keda Gel (HEP) û bi naven cihê û bi lîşkîn nuh li dirêjkirina emrê xwe digere. Listikeke nuh ji yên taze pîrsa "Hizbûlah e". Hizbûlah ne hizbûlah e, belê hizbûldewlet e, hizbûlerkan û hizbûlsezgîn e. Ev takîkeke nuh ji yên şerî taybetî ye û dirêjî û dewama MHP, UGD (Ülkü Ocakları), ETKO (Esir Türkleri Kurtarma Ordusu), TİT (Türk İntikam Tugayı), MİT (Millî İstihbarat Teşkilatı) û Kontrgerlera ye.

Taktîken ku iro dewlet li Kurdistanê bi naven cihê bi kar tîne. Û bi giş pere û qeweta xwe dixwaze Kurdan berde hev, Kurdan bi Kurdan bide kuştin û yekîtiya Kurdan xera bike nas in, giş takîken şerî taybetî ne û em ji tecrûbe xwe û welatîn din dizanîn.

Ne hewcîye, xwedîyê malê û diz bi hev hesiyane. Kurd dizê xwe nas dikin, diz dewlet e, polîs û tîmîn dewletê, kontra û mehepeyîn dewletê ne. Faşîstîn kevin û nuh in. Qatîl'dewlet e, militarisma Türk e. Dewlet xwe li pey ci veşer e, kîjan maskî bikşîne şerî xwe û kî ji xwe re bike mortal bila bike bê netice û vala ye. Dawî semizmayî û derketina ji Kurdistanê ye.

Me Kurdan lingîn xwe di xefkîn Osmanî, Kemalîzmî û Kozakçioğlu û şerî taybetî de xwariye. Me listîken Sîltan Evdilhemîd, Alayîn Hemîdiye, mektebîn Eşîrân û giş dek û dolabîn dewletê naskirine. Em di vî alî de ji her xelkî zêdetir xwedî tecrûbe ne. Em nema tîn listîken dewletê û em nema bi hêsanî dikevin xefkîn aşê şerî taybetî.

Hizbûldewlet, hizbûlerkan û hizbûlsezgîn ji ji bo dewletê aspirînê çend rojî û wextî ne. Ew ji mehîkûmî iflaskirînê û qedera "korucitîyî", "qanûnîn poşmîniyî" û giş awayen şerî taybetî ne.

Sedik Tan qetil kirin

Destpêk rüpel 1

Endamî Komela Mafen Mirovi û endamî sazûmana Rêveberiya HEP û welatparêzê Kurd Sedik Tan li Batmanê ji aliye Hizbi-kontra ve hate kuştin. Sedik Tan berî jî gelek caran hatubî girtin û sîrgün kîrin. Sala çûyi jî dewletê di otomobilâ wî de bombe da teqandin, di vê bûyerê de ew û kurekf xwe ji mirinî filîtin; Sedik hingê ji çavekî xwe bû.

Li gor agahdaryen gîhîstîne destê me bûyerâ kuştina Sedik Tan bi vî awayî qewimî: Bi navê Şefik Polat yek telefonê mala Sedik dike û dixwaze pê re biþeyive, maliyê Sedik telefona cihê karê Sedik didin Şefik. Şefik vêca telefonê cihê karê wî dike û wî dawetê mala xwe dike. Saet li dora 9 an diçe mala Şefik. Di ser van telefon û çûn û hatinan re hîna nîv saet derbas dike an nabe xebera mirina Sedik ji teref Şefik Polat ve diþihîje malbata Sedik. Birayê Sedik, Hesen Tan ji li ser vê bûyerê tiştîn ku dizane bi vî awayî dibêje: Xebera mirina Sedik bi telefonê Şefik da me. Ji me re got sê kes di sikakê de erîşse ser Sedik kîrine û Sedik hatiye kuştin. "Em ji di cih de çûne sîluna bûyerê, me cesedî wî li wir nedît. Dûre em ber bi mala Şefik ye çûn, me dît ku

derdora xêniyê wî ji aliye polisan ve hatiye girtin. Min ji polisan re got ku ez birê Sedik im, polisek çû bi komîser re biþeyî vî hat ji me re got: "Sedik ne li vir e, ew birine nexweşxanê." Li ser vê yekê me lêda em çûn nexweşxanê, lê me li wir jî cenaze ne dit. Dîsa em zivirin hatin mala Şefik û em hîn bûn kî hêj nuh cenazê Sedik birine nexweşxanê. Di vê navbeynê de me dît ku Şefik bi polisan re ji mal derdi keve. Şefik xwest nêzîkî min bibe da ku bi min re biþeyive, bes polisan nehiş. Bûyer ne wek ku Şefik digot qewimî. Li gor gotinê midûrê şûbeaya Asayîş Sedik di hundir de hatiye kuştin. Pişî ku Sedik tê cem mala Şefik Polat sê kes pêl zîla apartmanê dikin, derîyê xweger (otomatik) ji qeta sisîyan tê vekevin, ev her sê kes ji dîkevin hundir û Sedik dikujin.

Li gor dîstîna Hesen Tan di vê bûyerê de tiştîn ku nayen zanîn bi ifadeya Şefik re wê derkevin meydânê û wê her tiştî kîfî bibe.

MERASIMA CENAZÊ SEDIK

Roja 21'ê Hezîranê, pişî ku tê şûştin cendekê Sedik saet li dora 3'ye nîvî li ala kesk û sor û zer dipêçin û ber bi goristanê ve dibin. Di rê de polis tê pêşîya wan digirin da ku ala kesk û sor û zer ji ser tabûta wî hildin, lê bi

hezaran kesen ku besdarî meşa cenaze bûbûn li ber polisan rabûn û daxwaza wan qebûl nekirin, di ser re jî alayekî de eynî rengî de û mezinir vekirin û mega xwe domkirin. 12 hezar Kurdîn welatparêz ji bo cenazê Sedik 5 km. meşîyan, dema gîhîstîn ser goristanê Serokê HEP a Batmanê Salih Özdemir derket ser bilindahiyek û wiha axivî: "Tişîz eji zîne dixwazîm ew e ku hûn li hev xwedî derkevin. Ger em li hev xwedî dernekevin emê hîna geleke caran werin ser vê goristanê."

Di nava bajêr de polisan gotinê nexweş ji meşvanen pîrek re gotin, li ser vê yekê jî di nav bera gel û polisîn taybetî de bûyer qewimî. Di van bûyeren de pozê xortekî Kurd şikest, 5 kes jî hatin girtin.

Sedik welatparêzîkî wisa dilşewisi bûku nikarîbû bêxebat bisekine. Geh li cenazeyen gerîlayen xwedî derdiket, geh işkenceyên ku dewletî li gundiyan dikir protesto dikir û bi her kesi dida zanîn, geh jî di berxwedan û serhîdanan de di pêş de cihê xwe digirt û raperinan her ges dikir. Par bombe xistin otomobilâ wî ew û kurê xwe Azad bi xedarı birfindar bûn, çavekî Sedik kor bû, bes Sedik netirsiya û bir û bawerîya wî bî têkoşîna rîzgarîya gelê Kurdistan hîn xwîrtir bû. Kurekî wî yê din jî niha di zîndana Amedê de ye ji ber ku alîkarf bi Partiya Karkeren Kurdistan re kiribû.

bêhtîf 20 salan e ku di holê de ye. Di van salan de derfet û imkânîn mezin ji bo têkoşînê di desten me de tune bûn. Pişî ketina Sovyet ev derfet bi dest me ve hatin. Lî van dawîyan, gava hêzîn Ermeniyan yên leşkerîn di riya Laçînê re erîş anîne ser leşkeren Azeriyan, em bê teref man û me rî li ber wan vekevî, da ku tu rîyeke din tune bû ji bo Ermenistan alîkarîya miroverperîyê bide gelê Qerebaxê yê sîvîl. Tiştekî diyar e ku van cend salen dawîyê Qerebax jî hîla Azerbeycan ve ketibû nav cembereke zor, ci ji hîla leşkeren ve, ci ji hîla aborî û madî ve. Rewş di Qerebaxê de pîr dijar bûbûn. Li wir birgîbûn û xelaiyî pêş de hatibû.

-Hêza we ya leşkerî di ci rewş de ye?

-Van rojî dawî di weşanen gellek dewletan de li ser doza me nûce pîr derdikevin, lê hema di wan de behsa naskirina hikûmeta me nay kîrin, ji bo vî tiştî ve gavê tu tiştî na gotin. Di destpêka tevgera me de heya û her tenen gelê Ermenî û dewleta Ermenîstanê doza me nas dike û wê rast dibîne. Ev tiştî ji di dîroka herdu gelén me tê. Di nav sedsalan de Kurd û Ermenî cîrânê hev bûnî, bi hev re dostaniyek bas meşandine û her dem bi hev re li dijî dijiminê xwe şer kirine. Gelê Ermenî ji bi vî şeweyî bizava me nas dike û pîstgîriya xwe pêşneyar dike.

Ev yek di nav dosta niya gelan ya rast de tiştekî mirovahî û normal e.

-Hevkîriya we niha bi Ermeniyan re heye an na? Ger ku heye, ew li ser ci bingehê hatiye avakîrin?

-Belê, di hînek waran de hevkîriya me heye, bi taybetî di warê siyasi de. Da ku, wek min got, doza herdu gelén me di hînek xalan de bi hev ve tê girêdan. Ew ji ev xal in: Kurdistan Sor û Qerebax jî hîla dewleteke ve hatine dagîskirin, têkoşîna herdu gelan ji heq e, da ku herdu gel ji doza maşfe xwe yê çarenûsi dike û dixwazîn pêşeroja xwe bi desten xwe bîpejîrinin, ya mayîn; Kurdistan Sor û navbera Ermenîstanê û Qerebax de ye...

Neyarîn me dibîjîn ku goya pîrsa Kurdistan Sor Ermeniyan derxistiye hîlê. Ev ramana şaş ya dijimin e. Tevgera me ya ji bo Kurdistan Sor ev

bûye û hatiye damezirandin."

Li cihane ji bo aşîfî û birafît gavên li pêş tene avetiñ, belê li Tirkîyê siyaset hîna li paş demê û kevneperset e, me pêwist û zehf gîfing dît ku em partiyek serbixwe û wekhevî ava bikin. Iro li welêt pîrsigirêka hefî gîfing ya gelê Kurd e. Li welêt hêzîn tari li hemberî gel heşkerî qîrkirîn bêhesab dikin. Li hemberî çapemeyînê sansurek bê hesab tê meşandin.

Li Rojavayê welêt rîveberiyekê taybetî tê meşandin, mirovî herêmî tene kuştin û tene koç kîrin.

Hikûmeta qâlîşyone û hîla aborî de jiyanî mirovan hilweşandiye tar û mar kîriye, ji birçîbûnî li sikakan bi nanekî tene firotanê, jiyan ji gel re nema ye, gel ketiye astengek bêhesab.

Karker, gundi, memûr, esnaf êdi armanca xwe ji her tiştî birfinê desten wan li kar û xebatê sar bûye.

Ji ber vê yekê me pêwist dît û me vê partiyek ava kir. 36 endamên sazûmana rîveberiya ÖZEP hatin tesbît kîrin. Ji bo serokatiya partiyek ji Mahmut Alınak hate hilbijartîn.

Rîveberiya taybetî ..

Destpêk rüpel 1

MGK û hikûmeta Demirel û Înönü hevalen dirêjkirinê ne. Em ji niha ve karin bîjîn ku wê çar mehîn din jî rîveberiya taybetî bête dirêjkirin.

Belê herkes wek meclîsê, hikûmeta Demirel û MGK nafikire binêrîn bê serokê Baroya Balkesirê ci dibêje: "Li vir maşen mirovan ketine bin pê. Serokê Baroya Balkesirê Turgut Inal gotinê xwe wiha didomine: "Dewlet ketiye pey heyfa xwe û mesele kîriye dawa xwînê. Her roj cesedîn kuştanî de di televizyonan de radixe û pesnê xwe dide. Wek ku ev kar marifet û hunerek be. Li tu deran pîrsen terorî bi tanq, top û balafiran nehatiye çareserkirin.

Dermanê meselê heq e, edalet e, hîsqû e, helweste insanî ye û wekheye ye. Demokrasî ye, humreta insenî e, raxistina cesedîn mirovî kuşî, her sal girtina sedhezaran, işkencelerin û windakîrina mirovan ne çare ye."



(Jî çepê ve) komên "Botan" û "Dicle" berya destipêka lîstika finalê.

Spor jî berxwedan e

● Warê sporê jî ku baş were bikaranîn ji bo pêşveçûna têkoşîna neteweyî warek pîr girîng e. Spor mirovan ne tenê ciwan, bedew û bi hêz dike, spor mirovan bi aqil, kemal û terbiye jî dike. Ji ber vê yekê YCK di gellek bajarê Almanya de li cih û taxênu mîletê Kurd dimîne, komên sporê, bi taybetî jî yêñ fûtbolê damezrandine.

Îro gelê me hem li welêt hem jî li derveyê welêt di nava hemû çinê (qetê) gel de yekîtiyêن cihê-cihê ava kirine. Hinekan di bin ala cephâ xwe de yekîtiya xwe çêkiriye û kar û barêñ xwe bi çalakiyan dimeşînin, hinek jî bi rîexistinêñ sporê alîkarî didin têkoşîna xwe ya neteweyî û demokratîk. Bi kurtî hemû welatparêzen Kurd li ber xwe de ci ji destê wan tê dikin. Rîexistinek ji wan rîexistinêñ sporê jî Yekîtiya Ciwanêñ Kurdistan e. Ev yekîtiya xorten welatparêz şaxêñ xwe li gellek dewletêñ Ewrûpa, nemaze li Almanya çêkirine û bi rî xistine. Ev xebata ciwanêñ Kurdan ji aliye naveroka xwe ve gellek xwirt e û bi wate (mane) ye. Bê guman warê sporê jî ku baş were bikaranîn ji bo pêşveçûna têkoşîna neteweyî warek pîr girîng e. Spor mirovan ne tenê ciwan, bedew û bi hêz dike, spor mirovan bi aqil, kemal û terbiye jî dike. Ji ber vê yekê YCK di gellek bajarê Almanya de li cih û taxênu mîletê Kurd dimîne, komên sporê, bi taybetî jî yêñ fûtbolê damezrandine.

Jî BO BÎRANÎNA ŞEHÎDÎN GULANÊ

Di roja 14'ê Hezîranê de li bajarê Kolnê di navbera 12 (donzdeh) komên Kurdi yêñ fûtbolê de ji bo bîranîna şehîdîn şoresa Kurdistanê yêñ meha Gulanê li seranserê

Almanyayê lecek pêk hat. Pêwist e bînin ziman ku leceke bi vî şeweyî di meha Gulânê de di navbera 10 (deh) komên fûtbolê yêñ navçeya navendî ya Almanyayê de careke din jî pêk hatibû. Di wê demê de komên "Botan" û "Zeynel Akyar" ser ketibûn û angò xelata yekemîn û duyemîn girtibûn, herawa destûr stendibûn ji bo tevîl pêşvaniya komên hilbijartî bibin.

Hewcye bê gotinê ku îro gelê me ci li Kurdistanê û ci li derveyî welat di nava çinê xwe de yekîtiyê cihê cihê ava kirine, yêñ ku di bin ala ERNK de kar û barêñ xwe pêşve dibin. Rîexistinek bi wî şeweyî jî Yekîtiya Ciwanêñ Kurdistanê ye (YCK). Ev yekîtiya xorten welatparêz xebata bi naverokeke dewlemend re bala xwe dide ser warê sporê jî. Lewra ev karê rîexistinî yê pêkanîna van leca jî her sal yekîtiya ciwanan hildide ser milêñ xwe.

Herwiha di wê roja Hezîranê ya xweş de, di bin siya ala ERNK'ê de û bi bangdayina slogan "Bi can, bi xwîn em bi te re ne ey Serok" van komên jérîn dest bi lecê kirin:

Beşê "A"

"Sasûn"
"Zeynel Akyar"
"Serhed"
"Xorten Kurdistan"(Holanda)
"Bagok"
"Dicle"

Beşê "B"

"Welat"
"Firat" (Belçika)
"Dêrsim"
"Agid"
"Botan"
"Serkeftin"

Piştî lîstikên di navbera komên van besan de, çar kom hatin hilbijartîn ji bo hilgirtina fincana lecê. Ev kom jî ev in:

1. "Botan"
2. "Dicle"
3. "Dêrsim"
4. "Xorten Kurdistan"

Ji bo fincana yekemîn û duyemîn komên "Botan" û




Çar xelatêñ leca fûtbolê.

"Dicle" bi hev re daketin xwe de bi nav û rûmet e.

Lê wek hat diyarkirin, koma "Botan" şansekî pîr mezin bi destê xwe ve anî. Lîstikvanê wê bi zîrekî û çalakiya xwe ve hêjayî karkirinê bûn, dema wan top rastî dergê golê dikirin, derba wan vala ne diçû.

Belê, lîstik heta dawiyê bi moral û slogan bûn. Li derdorê deşta lîstikê bi ale ERNK'ê, wêneyêñ Serok û şehîdîn Gulânê ve xemili bûn, temaşevanan jî bi dengê def û zurne, dîlan dikirin, komên folklorê bi cilêñ kesk û sor û zer derketibûn meydanê...



Wêneyek jî lîstika komên "Dicle" û "Dêrsim".

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar • Mudurê Dezgahê (Müessese Müdürü) Zübeyir Çakır • Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazî İsleri Müdürü) Mazhar Günbat • Navîşan (Adres): Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Kat:1 D. 4 • Çağaloğlu / İstanbul • Tel: 511 57 60-511 66 02 • Fax: 511 51 57 • Berpirsiyariya a Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715 • Çapkirin (Baskı): Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım AŞ